# kevir kaxez meqes

## Piştevaniya Psîkososyal a bo Zarokan di Qonaxên Pevçûnê de û Rola Hunerê

Batman, Diyarbekir, Mêrdîn, Şernex, Wan
2015-2020 | Rapora Lêkolînê

Ebru Ergin • Ezgi Koman



ANADOLU KÜLTÜR

# KEVIR, KAXEZ, MEQES

## Piştevaniya Psîkososyal a bo Zarokan di Qonaxên Pevçûnê de û Rola Hunerê

Batman, Diyarbekir, Mêrdîn, Şernex, Wan
2015-2020

Rapora Lêkolînê

**Ebru Ergin • Ezgi Koman**

ANADOLU KÜLTÜR

FRIEDRICH EBERT STIFTUNG

*KEVIR, KAXEZ, MEQES*
*Piştevaniya Psîkososyal a bo Zarokan di Qonaxên Pevçûnê de û Rola Hunerê*
*Batman, Diyarbekir, Mêrdîn, Şernex, Wan*
*2015-2020 | Rapora Lêkolînê*

ANADOLU KÜLTÜR

Cumhuriyet Caddesi No: 40 Ka-Han Kat: 8
Elmadağ – İstanbul
info@anadolukultur.org
www.anadolukultur.org

Nîsan 2021, Stenbol

FRIEDRICH EBERT STIFTUNG

*Ev lêkolîn bi hevkariya Nûnertiya Komeleya Friedrich-Ebert-Stiftungê (FES) ya Tirkiyeyê hatiye amadekirin. Nêrînên vê raporê, nêrînên Nûnertiya Komeleya FESê ya Tirkiyeyê temsîl nakin.*

**Nivîskar** Ebru Ergin, Ezgi Koman
**Koordînatora projeyê** Derya Bozarslan
**Wergera ji tirkî bo kurdî** Abdulsıttar Özmen
**Edîtor | kurdî** Siyabend Aslan
**Edîtor | tirkî** Eylem Ertürk
**Xwendina dawî | kurdî** Samed Doğan
**Xwendina dawî | tirkî** Asena Günal
**Sêwirandin** Şengül Ertürk, Gökşin Uğur
**Deşîfre** Ronayî Seyhan
**Alîkarê projeyê** Nûnertiya Komeleya Friedrich-Ebert-Stiftungê ya Tirkiyeyê

***Wêneyê bergê** aîdî projeya "Huner li Bajarê Min e" ye (Batman, 2019) ku di çarçoveya Bernameya Piştevaniyê ya Xebatên bo Zarokan de alîkarîya wê hatiye kirin.

Ebru Ergin | Piştî ku sala 2007an Beşa Derûnnasiyê ya Zanîngeha Hacettepeyê diqedîne di salên 2007-2011an de di sazgehekê de wekî derûnnas û koordînatora perwerdehiyê dixebite ku ev sazgeh bo mirovên astengdar xizmetê dike. Sala 2012an di Beşa Derûnnasiyê ya Zanîngeha Ufukê de di qada derûnnasiya geşedanê de dest bi perwerdehiya lîsansa bilind dike û sala 2015an mezûn dibe û pisporiya xwe bi dest dixe. Ji sala 2012an û vir ve bi gelemperî di qada civaka sivîl de xebatên xwe  bi rê ve dibe. Koordînatoriya Navenda Giştî ya Komeleya Derûnnasên Tirk dike û ji bilî vê di gelek sazgehên civakî yên sivîl de li ser 'mafên zarokan' xebatan dike. Sala 2017an di Beşa Xizmeta Civakî ya Zanîngeha Hacettepeyê de dest bi doktorayê kiriye û xebatên xwe li vir didomîne. Li ser mijarên mafên zarokan, şideta li hemberî zarokan, serboriyên trawmatîk ên zarokan, pergala dadmendiyê bo zarokan û etîkê lêkolînan dike û di çarçoveya van mijaran de xebatên xwe bi rê ve dibe.

Ezgi Koman | Piştî ku Beşa Perwerdehî û Geşadana Zarokan a Zanîngeha Hacettepeyê diqedîne, sala 1998an Pirtûkxaneya Zarokan a Çatiyê û Kargeha Hunerê ava dike û bi rê ve dibe. Di salên 2000-2006an de rêvebiriya karê nivîsan a Çoluk Çocukê -kovara mehane ya bo dê, bav û perwerdekaran- dike ku armanca vê kovarê ew bû ku erkên Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî bi cih bibin. Di Çiriya paşîn a 2006an û Temûza 2012an de rêvebiriya parêzvanî û diyalogê ya Platforma Hevpar ya Mafên Mirovan kiriye. Ji sala 2012an heya 23ê Çiriya paşîn a 2016an ku bi Biryarnameya di Hikmê Qanûnê de hat girtin di Komeleya Gündem Çocukê de ku yek ji avakera wê bû, Rêvebiriya Navenda Mafên Zarokan kiriye. Koman, di salên 2004-2008an de Koordînatoriya Mafên Zarokan ya Şaxa Tirkiyeyê ya Rêxistina Efûyê jî kiriye û li Tirkiyeyê bo ku mafên zarokan bi awayekî sîstematîk bên çavdêrîkirin û raporkirin xebatan dike. Di heman demê de di rojnameya Yeni Yaşamê de li ser mafên zarokan quncik-nivîsên heftane dinivîse.

# NAVEROK


Destpêk ........ 1

## I • NÊZÎKAHÎTÊDANA BINGEHÎN Û PAŞXANE

I-1. Zarokatî û Trawma ........ 5
I-2. Bandora Pevçûnên Çekdarî li Zarokan ........ 7
I-3. Huner di Bernameyên Piştevaniya Psîkososyal de ........ 9

## II • BERGEH Û RÊBAZ

II-1. Çarçoveya Lêkolînê ........ 12
II-2. Qada Lêkolînê: 5 Bajar ........ 13
II-2.1. Diyarbekir ........ 13
II-2.2. Şernex ........ 15
II-2.3. Mêrdîn ........ 16
II-2.4. Wan ........ 16
II-2.5. Batman ........ 17
II-3. Profîla Beşdaran ........ 17
II-4. Têbinî bo Rêbazê ........ 18

## III • NIRXANDIN Û DAHÛRÎN

III-1. Qonaxa Amadekariyê ........ 21
III-1.1. Diyarkirina Armanca Xebatan ........ 21
III-1.1.1. Kêmkirina Bandora Trawmayê ........ 21
III-1.1.2. Xwegihandina Hunerê ........ 24
III-1.1.3. Avakirina Qadên Ewle ........ 24
III-1.1.4. Piştevaniya Bixwebawerî û Serkeftina Akademîk a Piştî Rewşa Awarte 25
III-1.1.5. “Başkirina Xwebixwe...” ........ 25
III-1.1.6. Piştevaniya Bikaranîna Zimanê Zikmakî ........ 26
III-1.2. Destnîşankirina Rêbazên Xwegihandina Zarokan û Zarokên ku dê Xebat bo Wan Bê Kirin ........ 27
III-1.2.1. Kîjan Zarok û bo Çi? ........ 27
III-1.2.1.1. Nêzîkayiya Fizîkî û Nasîtî ........ 27
III-1.2.1.2. Dezawantaja Civakî-aborî ........ 29
III-1.2.1.3. Pêdiviya Piştevaniya Taybet bo Zarokan ........ 29

III-1.2.2. Rêbazên Xwegihandina Zarokan ... 30
III-1.2.2.1. Serdana Malan û Agahdarkirina Dêûbavan ... 30
III-1.2.2.2. Xwegihandina bi Rêya Têkiliyên Takekesî û Rêbazên Din ... 31
III-2. Qonaxa Sepanê ... 33
III-2.1. Plansaziyên Berî Sepanê ... 33
III-2.1.1. Destûr, Erêkirin û Agahdarkirin ... 33
III-2.1.1.1. Erêkirina Dêûbavan ... 33
III-2.1.1.2. Qonaxa Destûrê ya Sazgehên Fermî ... 34
III-2.1.2. Xurtkirina Sepaneran ... 34
III-2.1.3. Çalakiyên Sereke û Amûrên Hunerê yên Hatine Bikaranîn ... 36
III-2.2. Pirsgirêkên Sepanê, Rîsk û Sînordarî ... 39
III-2.2.1. Butçeya Kêm ... 39
III-2.2.2. Kêmasiya Pisporiyê di Mijara Trawmayê de ... 40
III-2.2.3. Cihên bo Xebatan Bêewle û Ne Guncav ... 41
III-2.2.4. Rewşa Siyasî û Nirxên Newekhevîxwaz ên Civakê ... 41
III-3. Bandora Hunerê ... 44
III-3.1. Hêza Hunerê ya Sazker ... 45
III-3.2. Bandora Hunerê li Hêza Derbirînê ... 45
III-3.3. Danûstandina bi Zarokan re ... 46
III-3.4. Bandora Hunerê li Sazkirina Zimanekî Hevpar ... 46
III-3.5. Bandora Hunerê li Derbirîna Hestan ... 47
III-3.6. Sazkeriya Hunerê bo Mezinan ... 48
III-3.7. Xwenasîna bi Rêbazên Nû ... 48
III-3.8. Huner bi Zimanê Zikmakî ... 49
III-4. Pêdivî û Pêşniyazên Derbarê Pêşerojê ... 49
III-4.1. Pêdiviyên bo Berdewamiya Xebatan ... 50
III-4.2. Pêşniyazên Beşdaran yên Derbarê Bernameyên Perwerdehiya Xurtkirinê yên Qonaxa Amadekariyê ... 51
III-5. Bandora Şewba Covîd-19ê li Xebatan ... 51

## IV • ENCAM Û PÊŞNIYAZ

IV-1. Encam ... 55
IV-2. Pêşniyaz ... 56

# DESTPÊK

*Ji bo Zarokan*

Xala 6em a Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (PMZ-NY), mafê zarokan ê jiyan, saxmayîn û geşedanê wisa rave dike;

1. Dewletên aliyê peymanê qebûl dikin ku her zarok xwedî mafê bingehîn ê jiyanê ye.
2. Dewletên aliyê peymanê, heya ji wan tê hewl didin ku zarok bijîn û geş bibin.[1]

Wekî hemû dewletên ku peyman îmze kiriye Tirkiye jî berpirsiyar e ku berî her tiştî rewşxweşiyê bo hemû zarokan[2] dabîn bike, wan biparêze, xurt bike û bi pêş bixe, piştevaniya wan bike û pêwîst be wan baş bike û "bo jiyana xwe bidomînin û xurt bibin hewl bide" ku di nav sînorên wê de dijîn.

Ji dîroka Tirkiyeyê ku bi binpêkirina mafê mirovan dagirtî ye di qonaxên curbicur de ya ku bûye para zarokan mirin, bêpariya ji derfetên tendirustî û perwerdehiyê, koçberkirin û hejarî ye. Gava em li serdema nêz dinêrin em dibînin ku mînakên vê yên herî giran sala 2015an û piştî wê xuya dibin. Pevçûnên li nav bajaran, teqîn, teşebisa darbeyê, rêxistinên civakî yên sivîl ku bi rewşa awarte re an piştî wê hatin girtin, qeyûmên bo şaredariyan hatin tayînkirin û girtina pêşengên siyasî, rojnameger, rêvebirên civakên sivîl... Ango serdemeke tije krîz.

Veguhastinên civakî, aborî, demografîk yên herêmî û neteweyî ku ji sala 2015an û vir ve tên dîtin, bi giştî li civaka sivîl û bi taybetî jî li qada xebatên bo zarokan gelekî bandor kir. Di vê çarçoveyê de, bo em rewşa heyî û veguhastinan bibînin û bi windayî û destkeftiyan pênc salên dawî yên mafên zarokan û qada xebatên bo zarokan binirxînin me lêkolîneke berfireh kir. Ev lekolîna ku di navbera Temûza 2020 – Nîsana 2021ê de hat kirin, me li wan sazgeh û stratejiyan nêrî ku hunerê wekî amûrekê bi kar tînin û me hewl da pêdiviyên heyî û yên veguhastî bi curbicur aliyan pênase bikin. Lêkolîn ji Navenda Mafên Zarokan-KKRHyê bi Ebru Ergin û Ezgi Koman hat rêvebirin. Ev rapora encama lêkolînê li ser wan bernameyên piştevaniya psîkososyal sekiniye ku dixwazin bandora pevçûnan a li zarokan -ji binpêkirina mafê jiyanê bigire heya

---

1 UNICEF, Peymana Mafên Zarokan

2 Xala 1em a Peymana Mafên Zarokan gotiye; "Heya hijdeh saliya xwe her mirov zarok e." û sînorê zarokatiyê nîşan kiriye.

koçberbûn û astengkirina bidestxistina mafê perwerdehî û dermankirinê- ji holê rakin. Bi vê lêkolînê me hewl da bibînin bê di bernameyên bo zarokan de, huner çiqasî û çawa hatiye bikaranîn û bandora hunerê ya li qonaxên pakbûna zarokan û zehmetî û encamên sepanê tesbît bikin. Di çarçoveya lêkolînê de me li Batman, Diyarbekir, Mêrdîn, Şernex û Wanê bi tevahî bi 58 kesan re -bi sedema bergiriyên şewba cîhanî Covîd19ê- hevdîtinên berfireh yên onlayn kirin ku 42 ji wan, nûnerên 33 sazgehên cuda bûn û 16an jê bi serê xwe xebat bi rê ve dibirin. Rêxistinên civakî yên sivîl ku bo zarokan xebatên hunerî dikin, sazgehên hunerê, nûnerên qada giştî, perwerdekarên ku bi serê xwe xebatên hunerê li dar dixin û aktîvîstên serbixwe tevlî hevdîtinan bûn. Armanca pêşî ya vê raporê ku encamek ji yên lêkolînê ye ew e ku; **rola çalakiyên hunêrê û bandora wan a li zarokan a di pratîkên piştevaniya psîkososyal de vekolin ku bi zarokan re an bo zarokan li herêmên pevçûnê tên kirin**. Di vê çarçoveyê de;

- Me komebikêrî, nêzikahîtêdan û amûrên hunerê ku di perwerdehiyê de bi kar anîne yên rêvebirên xebata bo zarokan tesbît kirin.
- Me nirxandina wê kir ku gelo sazgeh û xebatkarên serbixwe bo rewşên awarte yên mîna şer, koçberî û şewba cîhanî ya niha, erdhêj û/an şert û merc û pediviyên nû ku bi sedema van derdikevin/dê derbikevin xwedî bersivekê ne an na.
- Me hevkariya wê kir ku qadek bo nîqaşê ava bibe ku gava bi rêbazên hunerî xebat bibin, valahiyên di sêgoşeya piştevaniya psîkososyal, akademî û fêrbûna bi hunerê de dikaribin bên dîtin û bi liberçavgirtina dînamîkên herêmî jî ev bên telafîkirin û di piştevaniya psîkososyal de amûr, naverok û bikêrî bên pêşxistin ku nêzîkahîtêdanên hunerî jî vedihewînin.
- Me bi rêya xebatên hunerê yên bi zimanê zikmakî li wê nerî ku bê di xebatên bo zarokan de piştevaniya bi zimanê zikmakî çiqasî girîng e.
- Me analîzek kir ku bo bernameyên berfireh yên perwerdehiya xebatkarên qadê, naverokên resen, xebatên sazgehî yên piştevaniyê, sazkirina modelan pêşkêş dike.
- Me di mijarên curbicur de pêdivî û pêşniyazên bo perwerdehiyê berhev kirin ku bandorkeriya bernameyên piştevaniya psîkososyal yên kes û sazgehan zêde bikin ku bi rêbaz û amûrên hunerî bi rê ve dibin.
- Me derbarê bandora şewba cîhanî Covîd-19ê li xebatan çavdêriyên xwe pêşkêş kirin.
- Me pêşniyazên ji tecribeya qadê rêz kirin ku di demên pêş de xebat bi awayekî bandorker bidomin.

Anadolu Kultur ji sala 2002yan ku hatiye damezirandin û vir ve bi mebesta ku zarok çand û hunerê binasin, xwe bigihînin hunerê û piştevaniya vê bikin li gelek deverên Tirkiyeyê hem bernameyên li ser hunerê saz kirin hem bi materyalên curbicur hevkariya bernameyên heyî kir. Ji 2015an û vir ve van çalakiyên xwe di çarçoveya pêdiviyên girêdayî rewşa civakî û siyasî ya heyî de dualî li dar dixe. Ji aliyekî ve di çarçoveya Bernameya Piştevaniya Penaberan de, sazgehên civakî yên sivîl (SCS), înîsiyatîf û hunermendan tîne cem hev ku li Tirkiye û Almanyayê di vê qadê de dixebitin

û derfetê dide wê ku materyalên perwerdehiyê yên alternatîf bên sêwirandin û hilberandin. Ji aliyê din ve li wan bajaran ku piştî 2015an pevçûnan rû daye û girêdayî pevçûnan koç berev wan bûye -ku bûne sedema amadekirina vê raporê jî- Bernameya Piştevaniyê ya Xebatên bo Zarokan saz kiriye û bo SCS, înîsiyatîf, mamoste, aktîvîstên ku bo zarokên di xetereyê de dixebitin, bernameyên perwerdehiyê li dar xistine û bi hîbeyan alikariya projeyan kiriye. Ji sala 2015an û vir ve Bernameya Piştevaniyê ya Xebatên bo Zarokan ji Batman, Diyarbekir, Colemêrg, Mêrdîn, Şernex û Wanê 18 ji wan mamoste, hunermend, aktîvîst, derûnnas; 29 ji wan jî xebatkarên civaka sivîl bi tevahî bo 47 beşdaran di warê xebatên hunerê bo zarokan, mafên zarokan û nêzîkahîtêdanên pedagojik de “Perwerdehiyên Perwerdekaran” pêk anîn. Herwiha di qada xebatên bo zarokan de bo 70 projeyan bi awayê “Hîbeyên Piçûk” alîkarî hat kirin. Heya niha ji projeyên ku alîkarî bo wan hat kirin bi tevahî 2.650 zarokan sûd wergirt.

Di rewşên bilez yên mîna şer, pevçûn, erdhêj, koçberî û şewbê de li qadê rêbazên diyar û yên ku qismî be jî encamekê didin gelek caran tên tercîhkirin. Lêbelê ev rewş carina li ber wê dibe asteng ku pêdivî û rêbazên guherî bên dîtin. Girêdayî vê, bi nirxandinên beşdarên bernameyan, bi têkiliyên demdirêj yên bi saziyan re û bi encama nîqaşên me yên berdewamî ev xebat pêk hat. Xebat bi wê armancê hat birêvebirin ku pratîkên qadê yên sazgehên piştî sala 2015an binirxîne, li bikaranîn û veguhastina rêbazên hunerî di piştevaniya psîkososyal de bikole ku ev bersivek e bo pêdiviya lêkolîneke berfireh.

**Ev rapora ku em hêvî dikin bibe wesîle bo diyarkirina stratejiyên giştî yên qada xebatên bo zarokan û di çarçoveyeke dirust de piştevaniya sazgehan bê kirin**, hem bo Anadolu Kulturê hem bo sazgehên ku di vê qadê de dixebitin wekî reberêkê ye ku bernameyên perwerdehiya bi hunerê amade bikin. Em di wê hêviyê de ne ku lêkolîneke wisa û rapora encama wê, **valahiya qada xebatên bo zarokan dagire û bo lîteratûra qadê û pratîkên sazgehan hevkariyê bike**. Herwiha em di wê baweriyê de ne ku dê bo sazgehên rêvebirên xebatên bo zarokan û xebatkarên qadê bibe rêber ku bernameyên berfireh yên xurtkirina kapasîteyê li dar bixin, naverokên resen hilberînin û xebatên piştevaniyê yên sazgehî bikin.

*Derya Bozarslan, Nîsan 2021*

## *Spasî...*

*Ev rapora berhema xebateke dûvdirêj û bihûrgilî ji qonaxa ramanê pê ve keda gelek kesên rêzdar vedihewîne. Ji Navenda Mafên Zarokan KKRHyê spasî bo Ebru Ergin û Ezgi Koman ku ji qonaxa ramanê û vir ve di nav projeyê de ne û wan lêkolîn bi rê ve biriye, dane analiz kirine û rapor nivîsandiye, bo beşdaran ku tevlî hevdîtinên onlayn bûn û nêrînên xwe anîn zimên û spasî bo Ayşe Görür û Zehra Bıçak Karaman ku bi paşragihandinên xwe rapor xurt kir.*

# I

# NÊZÎKAHÎTÊDANA BINGEHÎN Û PAŞXANE

# I-1.
# ZAROKATÎ Û TRAWMA

**Zarokatî; qonaxeke jiyanê ye ku rûdan, tecribeyên fêrbûnê, bextewarî, hêvîşikestîn, xemgînî an jî tirs lê civîne û bêyî ku bên -an jî neyên- bibîranîn tevger, reftar û ramanên mirov difesilînin.[3]**

Keşfkirina psîkanalîzê ji aliyê Freud ve û bîrdoziya wî ya psîkanalîtîk a derbarê geşedana zarokan, bo pêşketina nêrîneke nû xwedî roleke mezin e ku dibêje tecribeyên qonaxa zarokatiyê gelekî girîng in ku zarok tê de bi awayê kesên têgihîştî nasnameya xwe saz dikin. Di çarçoveya bîrdoziya psîkanalîtîk de zarokatî; teşeyên gelek rewşên hestî yên bingehîn yên wekî pêbawerî, şahî, hêvî, tirs û xalên referansê ava dikin ku dînamîkên herî xeternak yên bi danûstandina jiyanê re diyar dikin. Ev nêrîna ku bi psikanalîzê geş bûye, dibêje; şêwejiyan û tecribeyên civakî yên qonaxa zarokatiyê bo geşedana zarokan xwedî roleke diyarker in û ji ber vê, dibe ku hemû şert û merc û hevkarîgeriya bi awayê neyînî nemaze şêwejiyanên trawmatîk geşedana zarokan rawestînin, rê li ber bigirin û bi sedema zererdayîna qonaxa sazkirina nasnameyê, bandoreke mezin li jiyana wan ya pêşerojê bikin.[4] **Şêwejiyana trawmatîk ya zarokan; "ji ber wan rûdan, rêzerûdan û mercan diqewime ku zarokan bi awayekî fizîkî an hestî wekî zerer an gefê tecribe kiriye an jî bandoreke ne baş li erkdariya wan a fizîkî, civakî, hestî an jî li derûniya wan kiriye ku xwe rehet hîs nekin."[5]**

"Rûdanên zarokan yên trawmatîk ji aliyê Tora Stresa Zarokan a Trawmatîk ya Neteweyî ya Amerîkanî wiha tê pênasekirin;

- Êrîşa zayendî û tacîz,
- Êrîşa fizîkî û tacîz,
- Tacîza hestî/xapandina ji aliyê derûnî ve,
- Guhnedan, bobelatên dubareyî,
- Nexweşî/kiryarên tibî,
- Dûçarbûna şideta ya nav malê yan şahidiya wê,
- Dûçarbûna şideta aresteyî koman an jî şahidiya wê,
- Dûçarbûna şideta giran a kesî an navkesî an jî şahidiya wê,
- Dûçarbûna bobelatên xwezayî an yên bi destê mirovan,

3 Psycho-Social Assistance for Children Affected by Armed Conflict (UNICEF, IRC, 1999, nêrîna dawî 25.02.2021 - Kurteya wergerê aîdî nivîskaran e) http://helid.digicollection.org/en/d/Js2670e/4.3.2.3.1.html.

4 h.b.

5 Psikososyal Destek Ağı Rehberi (TİHV Akademi, 2019, nêrîna dawî 25.02.2021) https://tihvakademi.org/wp-content/uploads/2019/11/PSDA-Rehberi-1.pdf, 1.

- Koçberiya bi darê zorê,
- Şer/terorîzm/şideta polîtîk,
- Şîna trawmatîk/veqetîn,
- Trawmayên bi sedema pergalê (cihêbûna ji malê ya bi awayekî trawmatîk, koçberbûna trawmatîk, jihevveqetandina xwişk û birayan, cihguherîna demkurt û hwd.)” [6]

Tora Stresa Zarokan a Trawmatîk ya Neteweyî ya Amerîkanî, ji bilî şideta polîtîk û şideta civakî û aborî ku bi sernivîsên cuda rave kiriye şer û pevçûnên çekdarî yên mîna şer û şideta dewletê jî wekî cureyên şidetê bi nav dike. Pevçûna ku di pênaseya “şideta polîtîk” de cihê xwe dibîne û şert û mercên têkildarî wê, zarokan bi birîndarî û heta kuştinê an jî dibêtiya rûbirûbîna van dihêle ku li gel tirs û xofa mezin bûye sedema koçberiya bi darê zorê, windabûna dêûbavan an dûrketina ji wan, şahidiya şidetê, guherîna tevger û pratîkên jiyanê, hilweşandina jêrxaneya têkildarî xizmetên herî mirovî û bêparbûna ji xizmetên bi vî rengî. Dûçarbûna van hemû rewşan, zererê dide geşedana zihnî, derûnî û fizîkî ya zarokan ku dê siberojê bi gelek awayên êş û trawmayê xwe bide der.

Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (PMZ-NY), welatên ku şerê çekdarî bi hev re dikin dixe bin wî barî ku zarok li gor hiqûqa navneteweyî bên parastin, bergiriya pêwîst bê kirin ku bandora pêkan a pevçûnê ya li ser komekê daxînin asta herî kêm û bo kiryarên bandorker bixebitin. Peymana têkildar, girîngiyeke taybet bi wê dide ku kiryarên navborî û bergirî ne cudaker bin. Herwiha ne tenê PMZ-NYli gel vê hiqûqa mirovperwer û hiqûqa mafê mirovan jî di şerên çekdarî de li ser “mafên zarokan” disekine û di serî de welatên ku şerê hev dikin hemû aliyên pevçûnê di vî warî de berpirsiyar dibîne.

Bidawîbûna şer û pevçûnê û jiholêrabûna şert û mercên pê re hatî nayê wê maneyê ku dawî li tecribeya trawmatîzebûna zarokan hatiye berevajî vê zarok, di pêvajoya domdar de hê jî bi gelek arîşeyên civakî û derûnî re rû bi rû dimînin. Di vê çarçoveyê de PMZ-NY, sûdwergirtina ji xizmetên civakî û tendirustî jî tê de bernameyên piştevaniya psîkososyal derpêş dike ku zarok ji encamên pevçûnên çekdarî yên rûxîner bên parastin û ji nû ve bên ser xwe. Di qonaxa pevçûnê de û piştî wê, gava di asta navneteweyî û xwecihî de, pêdiviya parastina mafên mirovî yên zarokan bê nirxandin eşkere ye ku berpirsiyariya rêxistinên civakî yên sivîl jî gelek e. Lêbelê dibe ku her gav ne hêsan be ku rêxistinên civakî yên sivîl (RCS) vê berpirsiyariya xwe pêk bînin. Sedemeke sereke ya vê ew e ku pevçûna heyî zerereke mezin dide xebatên rêxistinên civakî yên sivîl ku li herêmê dixebitin. Sedema din jî ya têkildarî zarokan e û ya herî girîng têkildarî têgihîştina derbarê zarokan e ku zarokan tenê bi awayê “qurbanên” jîngeha şer û pevçûnê rave dike û wan wekî objeyan dibîne, lê mixabin rê li ber wê digire ku li hember bandora demdirêj a şert û mercên dûçarbûyî mekanîzmayên parastin û xurtkirinê bi awayekî karîger bên bikaranîn.

6 h.b., 2.

# I-2.
# BANDORA PEVÇÛNÊN ÇEKDARÎ LI ZAROKAN

Nûnera taybet a Neteweyên Yekbûyî Graça Machel ku di navbera salên 1994-1996an de di warê bandora pevçûnên çekdarî li ser zarokan, lekolîneke cîhanî bi rê ve biriye, çîroka jiyana keç û lawên zarok a wê demê bi awayekî rêkûpêk berçav kiriye. Rapora ku piştî hevdîtinên bi gelek kesan re hatiye amadekirin, kiriye ku bandora pevçûnê ya fizîkî û psîkososyal ji aliyê hiqûqa navneteweyî ve jî bê qebûlkirin.[7] Rapora têkildar, li gel rêbazên pênasekirin, destnîşankirin û sepanê yên derbarê parastina zarokan bo hikûmet, saziyên navneteweyî û rêxistinên civakî yên sivîl jî pêşniyazan vedihewîne ku rê nîşanî me didin. Armanca Machel bi vê raporê ew e ku di qonaxên şer de rêgez û xalên bingehîn yên PMZ-NYyê wekî rastiyeke gerdûnî bên dîtin.

Bêguman, derbarê bandora jîngehên şer û pevçûnê li zarokan, divê em li ser "pênaseyên" Fona Navneteweyî ya Alîkariya bo Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) jî rawestin ku dê bi kêrî me bên. **UNICEF, li gel bandora jîngehên şer û pevçûnê li binpêkirinên mafê jiyanê yê zarokan, bandorên din jî bi awayê li jêr rave dike:**[8]

- Dibe ku bi sedema pevçûnê, zarok ji hêla jîngehê zererê bibînin an jî gava bi armanca parastinê mecbûrî cih biguherin, dûçarî birînên fizîkî bibin.
- Kêmbûna pêdiviyên sereke (xwarin, hêwirîn, paqijî û hwd) dibe ku di dema şer û pevçûnê de bandorekê neyînî li rewşa zarokan bike.
- Dibe ku bi sedema şer û pevçûnê zarok ji dêûbavên xwe dûr bikevin.
- Dibe ku zarok, bi  rûdanên wekî windabûna endamên malbatê û hevalan, mirin, birîndarbûn û zerera fizîkî ya malê û jîngehê yên ji aliyê hestî ve xembar û zehmet re  rû bi rû bimînin. Îhtimal e zarok ji ber ku sax mane; hestên mîna diltirsî, xemgînî, hêrs an jî sûcdariyê bijîn.
- Windabûna asayiya jiyana rojane û pêşbîniyê, bi cihguhertina mecbûrî/koçberiya bi darê zorê û rawestandina perwerdehiyê tê. Dibe ku ev windayî hestên ewlehiyê yên zarokan lawaz bikin.
- Dibe ku bi hin sedeman rê li ber lîstikên bo zarokan bingehîn û xwedî taybetmendiyên gerdûnî yên mîna keşfkirin, fêrbûn, hevkarî, serederîkirina pirsgirêkan, hêzdarbûnê bê girtin. Qadên ewle yên bo lîstikê ji holê rabin û ev rewş rê ji tevgera zarokan re nehêle.

---

7 Promotion And Protection Of The Rights Of Children, Impact of Armed Conflict on Children, (UN Secretary-General, 1996, nêrîna dawî 24.02.2021) https://sites.unicef.org/graca/a51-306_en.pdf

8 Psycho-Social Assistance for Children Affected by Armed Conflict (UNICEF, IRC, 1999, nêrîna dawî 25.02.2021- Kurteya wergerê aîdî nivîskaran e) http://helid.digicollection.org/en/d/Js2670e/4.3.2.3.1.html

- Dibe ku zarok di qonaxa şer û pevçûnê de dûçarî gelek sûcan (şidet, tacîz, destdirêjî û hwd) bibin an jî bibin şahidê van.

Gava em pirhêliya fizîkî, venasînî, derûnî ya van xalên li jorê bînin ber çavan, divê bernameyên psîkososyal yên bo piştevaniya zarokan yên dema/piştî şer û pevçûnê jî hem bi van xalan re hevterîb hem berfireh û pirhêl bin. Pêwîst e bername û kiryarên navborî li gor mafên mirovî bên sazkirin, taybetmendiyên zarokan yên geşadanî li ber çavan bigirin û li gor awayên bandorkeriya taybet a girêdayî zarokbûnê bên sêwirandin.

Têgiha "psîkososyal" ku UNICEF, bo zarokên di bin bandora pevçûna çekdarî de bi kar tîne; nêzîkayiya bandorên derûnî û civakî yên şer û pevçûnên çekdarî vedibêje.[9]

"Bandorên derûnî" ji wan rêzeserpêhatiyan pêk tê ku bandorê li hest, reftar, raman, bîr û kapasîteya fêrbûnê dike. Têgihîştin û watedarkirina van rûdanan a ji aliyê mirov ve, naveroka van serpêhatiyan destnîşan dike.

"Bandora civakî" jî bo bandorên serpêhatiyên şer û pevçûnên çekdarî yên ji hêla civakî ve û guherîna mecbûrî ku bi sedema windayî û veqetandinê di vê qonaxê de pêk hatiye û rengvedana wê li tekiliyên civakî û veguhastina van têkiliyan tê bikaranîn. Gava em behsa "bandora civakî" bikin, divê guherînên aborî ku ji ber pevçûna çekdarî pêk hatine jî bên bîra me.

**Hin faktor hene ku bergeha bandora psîkososyal a şer û pevçûnên çekdarî ya li zarokan, awayên bandorkeriya van şert û mercan a li ser zarokan û nerazîbûna wan destnîşan dikin.**

- Bo mînak, li gel ku temen, zayend, têkiliyên ewledar zarokan ji bandorên şer û pevçûnên çekdarî diparêzin, veqetîna ji dêûbavan an jî windabûna dêûbavan, birînên derûnî yên kûr li zarokan vedikin.
- Kêmayiya çavkaniyên aborî, bandora şer û peçûnên çekdarî ji gelek aliyan ve giran dike û rê li ber îstîsmara wan vedike.
- Têkiliya zarokan a bi komê re û danûstandina ku pê xwe di ewlehiyê de hîs dikin, bandora rûdanên trawmatîk sivik dike û bo hêzdariya wan dibe alîkar.
- Berdewamiya perwerdehiya zarokan û xwedîlêderketina nasnameyê a di qonaxa şer de bo wê dibe alîkar ku çîroka jiyana xwe şîrove bikin û li hember bandorên pevçûnê xwe ragirin.
- Faktoreke din jî maweya rewşa rûdana trawmayê ye ku bi pevçûnê rû daye û lez û kartêkeriya bernameya piştevaniyê ya bi rewşê re têkildar e.[10]

"Piştevaniya psîkososyal" a bo zarokan, wê îfade dike ku ji hêmû helan ve piştevaniya zarok an komên zarokan bê kirin û hêza wan bê xurtkirin. Bernameyên ku bi mebesta

9 h.b.

10 h.b.

piştevaniya psîkososyal tên sazkirin, ew mekanizma ne ku berî û piştî pevçûnê bo parastina berdewamiya lênerîn û piştevaniyê dibin alîkar û bergiriya bandorên tendirustiya derûnî -çi acîl çi demdirêj- dikin. Bernameyên piştevaniya psîkososyal, li gel ku bo pêçandina birînên derûnî û jinûvesazkirina civakî a zarok û komên zarokan dibe alîkar, wan ji rewşa **“qurbanên pasîf”** vediguhêze rewşa **“rizgarbûyiyên aktîf”**. Lêbelê bo pêkhatina vê, divê bernameyên piştevaniya psîkososyal yên bo zarokan bi hemû pêkhateyên xwe, pêşî zarokan bi wî awayî bibinin ku **“xwedî maf in û dikarin jiyana xwe kontrol bikin”**. Di vê çarçoveyê de divê mekanîzmayên piştevaniya psîkososyal yên bo zarokan bi hêviya sewirandina qonaxekê bibin alîkar ku hêza wan û potansiyela wan a ku bi sedema şer û pevçûnê nikarin bi kar bînin ji nû ve saz bikin.

UNICEF, di çarçoveya bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal de -di wextê şer de an piştî şer- bo jîngeheke parêzker û ewle, amaje bi wê dike ku hikûmet, civak û komên sivîl, dêûbav û zarok tevlî qonaxên bandorker yên derdora civakî, reftar û helwestan bibin û van koman derbarê bandora piştevaniya psîkososyal hişyar bikin û hêza wan xurt bikin.[11] **UNICEF, diyar dike ku du hêlên armanca bernameyên psîkososyal hene: Ya yekemîn teşwîqkirina derdoreke civakî ye ku hemû zarokan ji dûçarbûna rewşên xerab biparêze, ya duyemin jî ew e ku zarokên dûçarî rewşên xerab ku zererê didin geşedana wan a psîkososyal biparêze û wan baş bike ku dîsa bi ser xwe ve bên.**[12]

# I-3.
# HUNER DI BERNAMEYÊN PIŞTEVANIYA PSÎKOSOSYAL DE

Di salên dawî de bo piştevaniya psîkososyal a zarokên di bin bandora şer û pevçûnê de girîngiyeke mezin bi wê tê dayîn ku li cihê zîqbûna li ser dahûrîna derûnî, bo zarokan bi mebesta avakirina jiyaneke ewle û “asayî” çalakî bên lidarxistin.[13] **”UNICEF, bi mebesta sazkirina derdoreke bikêrhatî ku zarok baş bibin û dîsa bi xwe ve bên li gel dabînkirina perwerdehiyê lîstik û çalakiyên hunerî jî pêşniyaz dike. Lewra bo zarokên dûçarî trawmayên girêdayî şer û pevçûnên çekdarî rêbazên ku derfetê didin jinûvesazkirina jiyaneke asayî girîng in. Li gor UNICEFê drama, muzîk, kukla û xêzkêşî jî tê de bikaranîna hunere rêbazek e ku berî hemûyan tê.”** [14]

Di bernameyên piştevaniya psîkososyal de girîng e derfet bê dayîn ku zarok a di dilê xwe de derbirînin. Di vê qonaxê de pêdiviya zarokan bi amûrên bikêrhatî heye ku

11 Operational Guidelines: Community-Based Mental Health And Psychosocial Support In Humanitarian Settings, (UNICEF, 2018, nêrîna dawî 20.02.2021 - Kurteya wergerê aîdî nivîskaran e) https://www.unicef.org/media/52171/file

12 h.b. (Kurteya wergerê aîdî nivîskaran e)

13 Teacher Training Manual:The Psychosocial Care and Protection of Children in Emergencies” (UNICEF, 2009, nêrîna dawî 20.02.2021 - Kurteya wergerê aîdî nivîskaran e) https://resourcecentre.savethechildren.net/node/11148/pdf/Teacher-Training-Manual-–-Psychosocial-Care-and-Protection-of-Children-in-Emergencies-2009.pdf

14 Jean Claude Legrand û Peter Holtsberg, “The role of art in psychosocial care and protection for displaced children”, Forced Migration Review 6 (1999): 16. (Werger aîdî nivîskaran e)

çîroka xwe vebêjin, bên fêmkirin û dengê wan bê bihîstin. Çalakiyên hunerî ji vî alî ve gelek derfetan didin me.

Çalakiyên hunerî;

- Bo serederîkirina serpêhatiyên trawmatîk dibin alîkar. Bi çalakiyên ku bo xweîfadekirinê dibin alîkar û heta bi temaşevaniya lîstîkên ku li pêş wan tên lîstin derfetê bi dest dixin ku hest û ramanên xwe bidin der. Ev rewş di heman demê de bi wan dide fêmkirin ku tiştê hatiye serê wan dibe ku hatibe serê yên din jî.
- Fersendê dide zarokan ku li "dema niha" zîq bibin, hêviya wan xurt dike. Dibe alîkar ku zarok bi pêşeroja xwe dakevin, xeyalên xwe geş bikin û li heyatê vegerin.
- Ragihandin û hevbandoriya navbera hemsalan hêsan dike, wan ji rewşên xeternak yên wekî bengîtiya madeyan ya têkildarî şer û pevçûna çekdarî, dûçarbûna îstîsmara zayendî û hwd dûr dixe.
- Pêşkêşkirin û pêşandana çalakiyên hunerî, bo civakîbûna zarokan dibin alîkar.

Di bernameyên piştevaniya psîkososyal de ji aliyê bikaranînê hunerê ve hinek zehmetî jî hene. Her civak û çand xwedî teşeyên hunerê yên xweser e ku hestên xwe derbirîne. "Ji ber van cudahiyan, divê çalakiyên hunerê yên ku dê wekî rêbazekê di nav xebatên psîkososyal de cih bigirin, gelekî bi baldarî li gor çanda têkildar û bi referansên wê çandê bên plankirin. Mîna sepanên hunerî zehmetiyên ku bi van sepanan re jî rû didin li gor çand û civakan diguherin. Bo mînak, herçiqasî hin civak bandorkeriya erênî ya bernameyên piştevaniya psîkososyal a li zarokan qebûl bikin jî dibe ku xerckirina pereyan bo xebatên hunerî li gor wan tiştekî luks be." [15] "Ji bilî vê, dibe ku darîçavkirina encamên şênber yên bernameyên psîkososyal û bi heman awayî nirxandina wan zehmet be. Dibe ku ev rewş bandora bikaranîna hunerê jî veşêre." [16] Ji ber van sedeman, her xebata ku bandora hunerê ya li bernameyên piştevaniya psîkososyal derdixe holê gelekî girîng e.

Ev lêkolîna ku li gor vê girîngiyê hatiye sêwirandin; ji qonaxên şer û pevçûnên giran an jî sivik ku nêzî 40 salan e li Tirkiyeyê didomin û nemazê li cihên ku kurd zêde lê dijîn mafê jiyanê yên zarokan binpê dikin bigire heta sînordarkirina mafê perwerdehî û tedawiyê, koçberkirinê hay ji gelek tesîran heye. Bo jiholêrakirina van bandorên ku bi curbicur raporan hatine darîçavkirin, gelek kes û sazgeh bo zarokan bernameyên piştevaniya psîkososyal li dar dixin. Ev lêkolîna ku derdixe holê bê huner çiqasî û çawa hatiye bikaranîn, bondorên wê, zehmetiyên qonaxên bikaranînê û sedemên van zehmetiyan darîçav dike, peşkêşkirina perspektîfeke nû bo bernameyên piştevaniya psîkososyal yên pêşerojê jî armanc dike.

15 h.b., 19. (Werger aîdî nivîskaran e)

16 h.b., 19. (Werger aîdî nivîskaran e).

# II

# BERGEH Û RÊBAZ

# II-1.
# ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ

**Lêkolîn li ser bandora hunerê li xebatên psîkososyal yên bo zarokan hûr dibe. Qada xebatê parêzgehên Batman, Diyarbekir, Mêrdîn, Şernex û Wanê ne ku bi piranî kurd lê dijîn.** Xebatên piştevaniya psîkososyal yên têkildarî lêkolînê bi kes û sazgehên ku ji Fona Piştevaniyê ya Xebatên bo Zarokan a Anadolu Kulturê sûd werdigirin û bi wan hevdîtinan ku kesên çavkanî em berhêlî kirine, hatine diyarkirin. Girêdayî lêkolînê hewl hatiye dayîn ku em xwe bigihînin kes û sazgehên ku van xebatan dikin û binêrin bê çiqasî, çawa cih didin hunerê û çavdêrî û zehmetiyên wan fêm bikin. Di hevdîtinan de, wekî din amaje bi wê hatiye kirin ku şewba cîhanî Covîd-19ê çi bandor li xebatên derbarê zarokan kiriye.

Navbera Temûza 2015 û Tebaxa 2016an a çaxê lêkolînê ew qonax e ku li qadên jiyanê yên zarokan bixwe pevçûnan dest pê kiriye, operasyon hatine kirin û bi van hincetan qedexeya derketina kolanan hatiye ragihandin. **Çaxê xebatê Temûz 2015 - Tebax 2016 e ku piştî qonaxa rawestandina pevçûnên girêdayî meseleya kurdan[17] pevçûnan dîsa dest pê kir û li bajaran jî bi giranî rû dan û Tebaxa 2016 û Kanûna paşîn a 2020an e ku pevçûn li gor berê kêm bûbûn.** Navbera Temûza 2015 û Tebaxa 2016an a çaxê lêkolînê ew qonax e ku li qadên jiyanê yên zarokan bixwe pevçûnan dest pê kiriye, operasyon hatine kirin û bi van hincetan qedexeya derketina kolanan hatiye ragihandin. Bi sedema pevçûnan di vê demê de **bi giştî li 11 parêzgeh û ji hindikayî ve li 51 navçeyan 381 caran qedexekirina derketina derve** hatiye ragihandin **ku bi awayê fermî jî tê qebûlkirin.[18]**

Herçiqasî pevçûna giran a ku li bajaran di Tebaxa 2016an de dawî lê hat bi awayekî kêmtir dewam kiribe jî binpêkirina mafên zarokan nesekiniye. Bo mînak; hêzên ewlehiyê yên nav bajêr û kontrol û zordariya wan tirs xistiye dilê zarok û dêûbavan, mixabin li nav bajêr bi wesayîtên zirxdar **zarokan an jiyana xwe ji dest daye an jî birîndar bûne.[19]** Di heman qonaxê de, rewşa awarte ku 21ê Temûza 2016an hat ragihandin û kiryarên wê wekî hemû tirkiyeyê bandor li van bajaran jî kir. Bi Biryarnameyên di Hikmên Qanûnê de yên bo dema rewşa awarte, ji bilî dêûbavan, mamosteyên zarokan ên ku meyla xwe dane wan jî tê de bi hezaran karmendên dewletê ji kar hatin avêtin û bo şaredariyên bajarên mezin, bajar û navçeyan qeyûm hatin tayînkirin. Ji bilî van, gelek sazgehên civakî ku bo zarokan xebatên hunerê dikin û navendên herêmî ku bo zarokan xizmetê didin, hatin girtin. Li gel ku vê rewşa pevçûnê bandoreke giran li zarokan kiriye qada civakî ya sivîl jî bi helwestên zordariyê re rû bi rû hiştiye.

17 "Ev ew qonax e ku pevçûna girêdayî meseleya kurdan ya ji salên 1990î û vir ve, di navbera salên 2013-2015an de reng guheriye û mizakereyan dest pê kiriye."

18 Bilgi Notu: Sokağa Çıkma Yasakları / 16 Ağustos 2015 - 1 Ocak 2020, Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2020.

19 Rapor: 2009-2019 / Doğu ve Güneydoğu Anadolu Bölgesi Çocuk Hak İhlalleri, (Diyarbakır: İnsan Hakları Derneği Diyarbakır Şubesi Çocuk Hakları Komisyonu, 2020).

Parastina mafên mirovan zehmet; qada sivîl teng bûye.[20] **Helbet, ji rawestandina xebatên bo zarokan bigire bi heta tirsa ewlehiyê ya dêûbavan û derfeta bidestxistina çavkaniyan a sazgehan bandora vê qonaxê gelekî berbelav e.** Lê dîsa jî di vê qonaxê de xebatên bo zarokan ji aliyê kes û sazgehan ve dewam kiriye.

# II-2.
## QADA LÊKOLÎNÊ: 5 BAJAR

5 bajarên warê lêkolînê jî ew cih in ku xebat li wir bûne. Di demên pevçûna giran de, ji van bajaran li Diyarbekirê 61, li Mêrdînê 18, li Şernexê 13, li Colemêrgê 11, li Batmanê 2 caran qedexekirina derketina derve hatiye ragihandin. Herçiqasî di vê qonaxê de li Wanê qedexekirina derketina kolanan nehatibe ragihandin jî li navçe û gundên wê pevçûnên giran û sivik dewam kirine.[21] Di dema pevçûnan de herî kêm 123[22] zarokan jiyana xwe ji dest daye, bi hezaran ji cihê xwe bûne û bi hezaran jî mafê perwerdehiyê di serî de negîhane mafên bingehîn û azadiyê.[23]

Li gel cudatiya navbera bajaran li cihên ku bi piranî kurd lê dijîn pevçûnan bi tevahî li nêzî 2 milyon kesan bandor kiriye.[24] Gava em bifikirin ku ji % 30ê nifûsa Tirkiyeyê zarok in bi rehetî dikare bê gotin ku li herêma qada lêkolînê **hejmara zarokên ku vê qonaxê bandor li wan kiriye  herî kêm 600 hezar e**.

### II-2.1. Diyarbekir

**Li Diyarbekir û navçeyên wê tevahiya nifûsa zarokan 685.315 e.[25] Di çarçoveya lêkolînê de bi 36 kesan re hevdîtin hatiye kirin ku bo zarokan xebat bi rê ve birine.**

Li Diyarbekirê sala 2015an û piştî wê pevçûnan herî zêde li Sûrê rû daye. Sur di vê lêkolînê de, ji aliyê bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal ên bo zarokan jî ew navçe ye ku derketiye pêş. Li gor lêkolîna Baroya Amedê, li Sûra ku qedexekirina derketina kolanan a pêşî 6ê Îlona 2015an hatiye ragihandin;[26]

- **Di vê demê de axlebê wan ji Sûrê li Diyarbekirê herî kêm 26 zarokan jiyana xwe ji dest daye.[27]**

20 Özlem Kaya û Pınar Öğünç, Satranç, Saklambaç ve İnat: Zor Zamanlarda Sivil Toplum (İstanbul: Anadolu Kültür, 2020).

21 Bilgi Notu: Sokağa Çıkma Yasakları / 16 Ağustos 2015-1 Ocak 2020, (Ankara: Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2020).

22 Rapor: Çatışma Bölgelerinde Çocuk Hak İhlalleri, (Ankara: Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2019).

23 h.b.

24 İstatistiklerle Çocuk, TÜİK, 2019.

25 h.b.

26 Ön Araştırma Raporu: Sur Çocuk Hakları Araştırması, (Diyarbakır: Diyarbakır Barosu, 2018).

27 Rapor: Çatışma Bölgelerinde Çocuk Hak İhlalleri, (Ankara: Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2019).

- Dema pevçûna Sûrê an piştî wê nêzî ji %27ê zarokan ji dê an bavên xwe dûr ketine, ji %15 ji wan jî hem ji dê hem ji bavên xwe dûr ketine.
- Ji %71,1ê zarokên li  Sûrê çûne dibistanê ji %28,9ê wan nikarîne dibistana xwe dewam bikin. Heman lêkolîn, di nav sedemên bingehîn ên neçûna dibistanê de pevçûna li  Sûrê nîşan didin.
- Girêdayî qonaxa pevçûnê, rêjeya zarokên li Sûrê yên ku mecbûr mane li cihekî din bijîn ji %15,4 e. Nêzî ji %80yê zarokan mecbûr mane malên xwe, dibistanên xwe biguherînin. Di ser de bêhtir ji %70yê zarokan xistine wê rewşê ku du an zêdetir ji du caran dibistana xwe biguherin.
- Ji 4.985 avahiyan 3.569 jê hatine hilweşandin. Di nav qadên hilweşiyayî de cihên lîstika zarokan û park jî hene.

Piştî pevçûna giran di dema lêkolînê de li Diyarbekirê rewşa pevçûnê dewam kiriye. Vê carê, bi biryarnameyên rewşa awarte gelek kes ji karên xwe yên rêvebiriya dewletê, herêmî û zanîngehan hatin avêtin. Li Diyarbekirê di nav van kesan de 4314 mamoste jî cih digirin.[28] Di vê qonaxê de zarokên xwendekarên van mamosteyan ji mamosteyên xwe dûr mane. Li Diyarbekirê li hin dibistanan zarok û dê û bavên wan li hember jikaravêtina mamosteyan nerazîbûna xwe nîşan dane.[29] Li Diyarbekirê li gel avetina ji kar, yên bo zarokan xebatan li dar dixin jî tê de 47 rêxistinên civakî yên sivîl hatin girtin. Di heman demê de sazgehên çapemeniyê jî hatin girtin. Di nav van sazgehan de Zarok TV jî heye ku bo zarokan bi kurdî weşanê dike. Zarok TV, piştî demekê bi hevdîtin û îtîrazan dîsa dest bi weşana xwe kir.

Di dema rewşa awarte de bi Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de pêşî bo şaredariyên Diyarbekir,  Sûr û Farqînê, piştre jî bo şaredariyên din yên bajarên mezin û navçeyan qeyûm hatin tayînkirin. **Ji aliyê rêvebiriyên herêmî ve ku qeyûm bo wan hatine tayînkirin; hin navendên perwerdehî û hunerê yên bo xizmeta zarokan û dibistan jî hatin girtin.**[30] Piştî qonaxa pevçûna giran kiryarên rewşa awarte bandoreke neyînî li qada civaka sivîl kiriye û bûye sedema berdewamiya rewşa siyasî. Piştî rewşa awarte di 24ê Hezîrana 2018an de hilbijartinên rêvebiriyên herêmî pêk hatine. Lê dîsa bi heman awayî bo rêvebirên hilbijartî yên nû cara duyem qeyûm hatine tayînkirin. Li gel ku Diyarbekir bo xebatên qada sivîl li pêş e; komele, weqf û platform dikarin xebatên bandorker bikin, di vê qonaxê de xebatên qada sivîl rasterast di bin bandora rewşa siyasî de mane û di serî de ewlehî ji aliyê çavkanî, cih û hwd ve zehmetiyan xwe daye der.

28 Zeynep Altıok, OHAL Bilançosu Hak İhlalleri Raporu (Ankara: CHP, 2017), 5.

29 "Diyarbakır'da 30'a yakın öğrenci gözaltına alındı", evrensel.net (19 Eylül 2016, nêrîna dawî 25.02.2021), https://www.evrensel.net/haber/290613/diyarbakirda-30a-yakin-ogrenci-gozaltina-alindi

30 "Diyarbakır, Mardin ve Van'da önceki kayyum döneminde neler yaşanmıştı?", birgun.net (19 Ağustos 2019, nêrîna dawî 25.02.2021), https://www.birgun.net/haber/diyarbakir-mardin-ve-van-da-onceki-kayyum-doneminde-neler-yasanmisti-265421

## II-2.2. Şernex

**Li Şernex û navçeyên wê tevahiya nifûsa zarokan 230.422 ye.[31] Di çarçoveya lêkolînê de bi 6 kesan re hevdîtin hatiye kirin ku bo zarokan xebat bi rê ve birine.**

Şernex û navçeyên wê cihekî din e ku di tarîxên mijara lêkolînê de pevçûnên giran rû daye. Li navenda Şernexê û Cizîr, Silopî û Hezexê qedexekirinên derketina derve yên demdirêj û bênavber hatine ragihandin. Di vê qonaxê de;

**Li Şernex û navçeyên wê hejmara zarokên ku jiyana xwe ji dest daye herî kêm 78 e.[32]**

- Gelek tax ji ber pevçûnan hatine hilweşandin, gelek sivîlan jiyana xwe ji dest daye. Li taxên cihê pevçûnê ku hatine hilweşandin, mirov mecbûr mane koç bikin. Li gor daneyên Wezareta Karên Hundir li Şernexê jî herî kêm 55 hezar kes di vê qonaxê de ji cihê xwe bûye.[33]
- Li Şernex û navçeyên wê, di dema pevçûnan de zarokan demeke dirêj nikariye biçin dibistanê û nikariye ji xizmetên tendirustî û mafê tedawiyê sûd werbigirin.[34]
- Li Şernexê tenê 8 dibistan mane ku ji ber pevçûnan nehilweşiyane. Gelek mamosteyan ji tirsa canê xwe tayin xwestiye.[35]
- Li taxan dibistan, qadên lîstika zarokan, park hatine hilweşandin ku edî nikaribin bên bikaranîn.[36]

Di dema rewşa awarte de ku piştî pevçûnên giran hat ragihandin bo şaredariyên navçeyên Hezex û Cizîrê û şaredariya Şernexê qeyûm hatine tayînkirin. Li vê herêmê ku xebatên bo zarokan ne berbelav û bipergal in bi rewşa awarte li Şernex û navçeyên wê; bi tevahî 12 komele hatine girtin. Li Şernexê di nav karmendên dewletê yên îxrackirî de ji herî kêm 38 mamoste hene.[37] Piştî hilbijartinên herêmî yên sala 2018an, Kanûna pêşîn a 2018an pêşî Şernex di pey re bo şaredariyên Cizîr, Silopiya û Hezexê jî qeyûm hatin tayînkirin. Piştî pevçûna giran ev qonax bûye sedem ku li Şernexê jî rewşa siyasî ya bipevçûn dewam bike.

---

31 İstatistiklerle Çocuk, TÜİK, 2019.

32 Rapor: Çatışma Bölgelerinde Çocuk Hak İhlalleri, (Ankara: Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2019).

33 Didem Özel Tümer, "Hendeğin bilançosu: Nüfusun %22'si göç etti", aljazeera.com (11 Ocak 2016, nêrîna dawî 25.02.2021)
http://www.aljazeera.com.tr/al-jazeera-ozel/hendegin-bilancosu-nufusun-22si-goc-etti

34 "Sokağa çıkma yasakları sebebiyle 362 bin öğrenci eğitimden mahrum kaldı", t24.com (27 Aralık 2015, nêrîna dawî 25.02.2021)
https://t24.com.tr/haber/sokaga-cikma-yasaklari-sebebiyle-362-bin-ogrenci-egitimden-mahrum-kaldi,321983

35 "Şırnak'ta eğitim imkânsız görünüyor", gazeteduvar.com (9 Eylül 2016, nêrîna dawî 25.02.2021)
https://www.gazeteduvar.com.tr/gundem/2016/09/09/sirnakta-egitim-imkansiz-gorunuyor

36 Rapor: Çatışma Bölgelerinde Çocuk Hak İhlalleri, (Ankara:Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2019).

37 "İhraç edilen öğretmenlerin il il dağılımı", milliyet.com (15 Eylül 2016, nêrîna dawî 25.02.2021)
https://www.milliyet.com.tr/gundem/ihrac-edilen-ogretmenlerin-il-il-dagilimi-2311237https://www.milliyet.com.tr/gundem/ihrac-edilen-ogretmenlerin-il-il-dagilimi-2311237

## II-2.3. Mêrdîn

**Li Mêrdînê û navçeyên wê tevahiya nifûsa zarokan 337.219 e.[38] Di çarçoveya lêkolînê de bi 8 kesan re hevdîtin hatiye kirin ku bo zarokan xebat bi rê ve birine.**

Mêrdîn jî cihek ji wan e ku pevçûnên giran rû daye. Nemaze li navçeyên Kerboran, Nisêbîn û Dêrikê pevçûnan bi giranî rû daye, qedexekirinên derketina kolanan ên demdirêj û bênavber li van navçeyan jî hatine ragihandin. Di vê qonaxê de;

- **Li Mêrdînê û navçeyên wê hejmara zarokên ku jiyana xwe ji dest daye herî kêm 4 e.[39]**
- Di serî de Nisêbîn, li Dêrik û Kerboranê her der hatiye rûxandin, gelek kesan jiyana xwe ji dest daye û gelek malbat mecbûr mane ku koç bikin.
- Li Nisêbînê ku pevçûn gelekî giran bû, nêzîkî bidawîbûna pevçûnan 6 tax bi têlan hatin dorpêçkirin û bo çûnûhatina wan qedexe hat ragihandin, 45-50 hezar kes bi pirsgirêka hêwirînê rû bi rû man.[40]
- Li Nisêbînê bi tevahî 9 dibistan hatine hilweşandin, 22 dibistanan zerer dîtiye.[41]
- Qadên lîstikê û parkên zarokan ên li deverên şer û pevçûnan hatin wê rewşê ku êdî hew bên bikaranîn.

Piştî pevçûnên giran di dema rewşa awarte de bo Mêrdîn û şaredariyên navçeyan qeyûm hatin tayînkirin. 149 mamoste bi Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de ji kar hatin avêtin.[42] Li Mêrdînê yên ku xebatên hunerî jî dikin di nav de 11 komele hatine girtin piştre 5 ji wan dîsa vebûne. Piştî hilbijartinên herêmî yên 24ê Hezirana 2018an bi şaredariyên Diyarbekir û Wanê re bo Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê û şaredariyên navçeyan qeyûm hatine tayînkirin.

## II-2.4. Wan

**Li Wanê û navçeyên wê tevahiya nifûsa zarokan 462.458 e.[43] Di çarçoveya lêkolînê de bi 4 kesan re hevdîtin hatiye kirin ku bo zarokan xebat bi rê ve birine.**

38 İstatistiklerle Çocuk, TÜİK, 2019.

39 Rapor: Çatışma Bölgelerinde Çocuk Hak İhlalleri, (Ankara: Türkiye İnsan Hakları Vakfı, 2019).

40 "Nusaybin: Tel örgülerin ardında yakılıp yıkılmış bir kent", evrensel.net (23 Ağustos 2016, nêrîna dawî 25.02.2021) https://www.evrensel.net/haber/288278/nusaybin-tel-orgulerin-ardinda-yakilip-yikilmis-bir-kent

41 "TOKİ'nin Nusaybin'de inşa ettiği okullar eğitime açılıyor", tokihaber.com (11 Ağustos 2020, nêrîna dawî 25.02.2021) https://www.tokihaber.com.tr/haberler/tokinin-nusaybinde-insa-ettigi-okullar-egitime-aciliyor/

42 İhraç edilen öğretmenlerin il il dağılımı", milliyet.com (15 Eylül 2016, nêrîna dawî 25.02.2021) https://www.milliyet.com.tr/gundem/ihrac-edilen-ogretmenlerin-il-il-dagilimi-2311237

43 İstatistiklerle Çocuk, TÜİK, 2019.

Navenda Wanê ew cih e ku pevçûnên giran lê neqewimîne. Pevçûnan hîn bêhtir li navçeyên Artemêt û Elbakê rû dane. Di dema rewşa awarte de li Wanê 288 mamoste hatine îxrackirin.[44]

Di heman demê de Îlona 2016an pêşî bo navçeyên Wanê Qelqelî, Îpekyolu, Erdîş û Artemêtê paşê jî Çiriya paşîn a 2016an bo Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê, sala 2017an jî bo şaredariyên din qeyûm hatine tayînkirin. Herçiqasî li Wanê pevçûnên giran neqewimîbin jî di vê demê de ji Şernex û Colemêrgê gelek kesan koçî vir kiriye. Di vê qonaxê de herî kêm 4 hezar û 560[45] malbatan koçî Wanê kiriye. Piştî hilbijartinên herêmî yên 2018an mîna yên Diyarbekir û Mêrdînê bo Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê jî qeyûm hatiye tayînkirin.

### II-2.5. Batman

**Li Batmanê û navçeyên wê tevahiya nifûsa zarokan 246.411 e.[46] Di çarçoveya lêkolînê de bi 4 kesan re hevdîtin hatiye kirin ku bo zarokan xebat bi rê ve birine.**

Batman bajarekî kêmpeyda yê din e ku li nav bajêr pevçûnan rû nedaye. Lêbelê li Batmanê jî di heman demê de bo rêvebiriyên herêmî qeyûm hatine tayînkirin. Di dema rewşa awarte de; sazgehên bo zarokan xebatan dikin jî di nav de 11 komele hatine girtin. Di nav karmendên dewletê yên îxrackirî de 136 mamoste jî hene.[47]

## II-3. PROFÎLA BEŞDARAN

Li van bajaran rêxistinên civakî yên sivîl ku bi zarokan re xebatên hunerê dikin, sazgeh, nûnerên sazgehên hunerê, perwerdekarên ku bi serê xwe xebatên hunerê li dar dixin û aktîvîst tevlî lêkolînê bûne. **Di qonaxa lêkolînê de; bi 42 nûnerên ji 33 sazgehên cuda û 16 kesên xweser re bi tevahî 58 hevdîtin hatine kirin. Di nav van sazgehan de ku hevdîtin bi wan re hatine kirin, rexistinên civakî yên sivîl, sazgehên hunerê û navendên sazgehên dewletê yên têkildar cih digirin. Ji van sazgehan 10 jê rasterast derbarê zarokan xebatê dikin, 13 jê sazgehên hunerê ne. 20 sazgehên din jî ew in ku li gel birêxistina pîşeyî derbarê xortaniyê û qadên civakî-siyasî xebatê dikin û di vê qonaxê de bo zarokan bernameyên piştevaniya psîkososyal pêk anîne.**

4 ji van sazgehên ku bi mebesta xebatên bo zarokan tevlî lêkolînê bûne, ev nêzî 40 salan e bi wan zarokan re xebatan pêk tînin ku di bin bandora pevçûnên berdawam

44 "İhraç edilen öğretmenlerin il il dağılımı", milliyet.com (15 Eylül 2016, nêrîna dawî 25.02.2021) https://www.milliyet.com.tr/gundem/ihrac-edilen-ogretmenlerin-il-il-dagilimi-2311237

45 "Yüksekova'dan göç sürüyor", aa.com.tr (6 Nisan 2016, nêrîna dawî 25.02.2021) https://www.aa.com.tr/tr/turkiye/yuksekovadan-goc-suruyor/550297

46 İstatistiklerle Çocuk, TÜİK, 2019.

47 "İhraç edilen öğretmenlerin il il dağılımı", milliyet.com (15 Eylül 2016, nêrîna dawî 25.02.2021) https://www.milliyet.com.tr/gundem/ihrac-edilen-ogretmenlerin-il-il-dagilimi-2311237

de mane. Ev sazgeh nemaze li taxên bajarên mezin rasterast bi zarok, dêûbav û mamosteyan re xebatan dikin. Di heman qadê de, 6 sazgeh jî ew komele û înîsiyatîf in ku di dema lêkolînê de hatine damezirandin. Beşek ji van sazgehên nû jî wekî dewama wan sazgehan in ku di dema rewşa awarte de dûçarî zordariyê an Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de mane û deriyên xwe girtine. Bo sazgehên hunerê jî heman tişt derbasdar e. Li gel ku 5 ji sazgehan li bajar û navçeyan bo zarokan ji zû ve ye xebatên hunerê dikin, 8 sazgehên hunerê di dema lêkolînê de ji nû ve an nû hatine damezirandin.

Di nav 16 kesan de ku tevlî hevdîtin û xebatên takekesî bûne; 4 mamosteyên şêwirmend, 5 mamosteyên polê, mamosteyêk ji pêşdibistanê, 3 derûnnas û 3 hûnermend hene. Ji 58 beşdarên ku bi zarokan re xebatên hunerê dikin 16an jê ji bernameyên Xebatên bo Zarokan yên Anadolu Kulturê hem alîkariya fonê hem a perwerdehiya perwerdekariyê, 13an jê tenê alîkariya fonê standiye. Kes û sazgehên din bi serê xwe xebatên xwe bi rê ve birine.

# II-4.
## TÊBINÎ BO RÊBAZÊ

Herçiqasî kesên tevlî hevdîtinan bûne xebatên xwe bi awayê "bernameya piştevaniya psîkososyal" pênase nekiribin jî ev xebat ji aliyê rêbaz, armanc, bandor û dema kirinê ve vê taybetmendiyê vedihewîne. Têkildarî lêkolînê, di bernameyan de daneyên derbarê bandora hunerê hatine berhevkirin. Di vê çarçoveyê de, di hevdîtinan de derbarê sepanên din ku di bernameyên piştevaniya psîkososyal de cih digirin, dane nehatine berhevkirin. **Lêkolîn, bi bikaranîna teknîkên lêkolînên çawanî hatiye kirin. Daneyên berhevkirî bi dîrektîfên pirsyarî yên nîvsazkirî bi rêya hevdîtinên komî yên nîvendî, onlayn hatine kirin. Berî hevdîtinên komî yên nîvendî ji kes û sazgehan re rapirsîna onlayn hatiye şandin, bi van rapirsînan agahiyên sazgehî hatine berhevkirin û hevdîtinên komî yên nîvendî hatine plankirin.**

Di hevdîtinan de, ji bilî agahiyên giştî yên derbarê xebatê;

- Diyarkirina zarokan bo xebatê,
- Sedema hilbijartina zarokan (Kîjan, ji ber çi hat hilbijartin),
- Bikaranîna rebazên bo xwegihandina zarokan,
- Qonaxên destûr, êrêkirin, plansaziyê yên berî xebatê,
- Bernameyên xurtkirinê yên bo sepaneran,
- Çalakiyên lidarxistî û amûrên hunerê yên hatine bikaranîn,
- Sepanerên van çalakiyan,

- Dabînkirina wê bê dêûbav çawa beşdar bûne,
- Zehmetiyên qonaxa pêkhatinê, rîsk û tehdîtên dema xebatê

Ew xal in ku li ser wan hatiye rawestin. Li gel vê çavdêriyên beşdaran yên derbarê hunerê jî di xebatê de cih digirin. Bo berdewamiya xebatan, pêşî li ser pêşniyaz û pêdiviyan di pey re jî li ser bandora şewba cîhanî Covîd-19ê ya li xebatan hatiye rawestin.

Tevahiya rêvebirên xebatê ne ew kes in ku hevdîtin pêk anîne. Di nav rêvebirên xebatê de psîkiyatrîst, derûnnas, şêwirmendên derûnî, mamosteyên perwerdehiya bedenê, mamosteyên zanistên civakî, mamosteyên polê, mamosteyên resmê, perwerdekarên çîrokbêjiyê, pisporên geşedana zarokan, peykersaz, wênekêş, civaknas û dilxwazên ku xwe bi awayê aktîvîstên parêzkarê mafê zarokan pênase dikin hene. Rêvebirên van xebatan, bi piranî ji kesên li wê herêmê pêk tên. Di hin xebatan de li gel rêvebirên herêmî pisporên ji bajarên cuda jî cih girtine. Di nav xebatan de bernameyên ku bi du rêvebiran hatine lidarxistin jî hene. Di xebatên bi du rêvebiran de wisa hatiye plankirin ku yek axiverê tirkî yek jî yê kurdî be, tercîha din a plankirî ew e ku yek ji qada hunerê yek ji qada tendirustiya derûnî be.

Di çarçoveya etîk a lêkolînê de îfadeyên ku nasname û agahiyên hesas yên derbarê kes û saziyan eşkere dikin, di raporê de cih nagirin. Ji ber vê, di hemû raporê de navên kes û sazgehên ku hevdîtin bi wan re hatiye kirin, anonîm in.

# III

# NIRXANDIN Û DAHÛRÎN

Di vê beşa lêkolînê de agahiyên ku ji hevdîtinên beşdaran yên onlayn hatine bidesxistin, li gor armanca xebatê hatine dahûrîn û parvekirin. Daneyên lêkolînê girêdayî xebatên beşdaran bi qonaxa amadekariyê, qonaxa pêkhatinê, bandora hunerê, pêdiviyên derbarê pêşerojê û pêşniyaz û bandora Covîd-19ê ya li xebatan hatine pêşkêşkirin.

# III-1.
# QONAXA AMADEKARIYÊ

Wekî ku ji beşa bergeh û rêbazê jî tê dîtin, bernameyên piştevaniya psîkososyal yên bo zarokan, piştî qonaxa pevçûnên giran û sivik di şert û mercên rewşa awarte û siyasî de pêk hatine ku pevçûnan hikim li wan kiriye. Di vê çarçoveyê de, parçeyekî girîng ê xebatê ye ku em agahî û nirxandinên merhaleyên berî xebata bo zarokan peşkeş bikin. Di vê beşê de, bi binnivîsên, "diyarkirina wê ku armanca xebatê bi kîjan krîteran û çawa hat destnîşankirin" û "rêbazên xwegihandina zarokan" dê agahiyên derbarê qonaxa amadekariyê bên pêşkêşkirin.

## III-1.1. Diyarkirina Armanca Xebatan

Gava em agahiyên beşdaran binirxînin ne şaş e em bêjin hema hema armanca hemû xebatan ew e ku di qonaxa piştî pevçûnê de zarok bihêz bibin. Lêbelê gava em bi hûrgulî lê binêrin tê dîtin ku ev armanca sereke hin binearmancên cuda jî vedihewîne. Agahiyên derbarê armancên xebatê, li gor asta dahûrîna naverokê bi şeş kategoriyan hatine nirxandin: Kêmkirina bandora trawmayê, dabînkirina xwegihandina hunerê, pêkanîna qaden jiyanê yên ewlekar, piştevaniya bixwebawerî û serkeftinê ya piştî rewşa awarte, 'başkirina xwebixwe' û piştevaniya bikaranîna zimanê zikmakî

### III-1.1.1. Kêmkirina Bandora Trawmayê

Herçiqasî gava beşdaran derbarê xebatên xwe agahî dane rasterast bi awayê "kêmkirina bandora trawmayê" gelek caran têgihîkirinek bi kar anîbe jî tê fêmkirin ku vegotinên têkildarî armancê rasterast aresteyî bandora trawmayê ne. Ev rewş ji îfadeyên beşdaran yên wekî "daxistina bandorkeriya zarokan bo asta herî kêm, başkirin û xurtkirina zarokan, dabînkirina rewşeke baş bo zarokan, geşkirina şiyana serederîkirina trawmayê û şiyana jiyanê" tê fêmkirin.

Agahiyên ji lêkolînê hatine bidestxistin,  delîlên şênber nîşan didin ku zarok piştî qonaxa pevçûnê pirsgirêkên psîkososyal dijîn;

- Zarokên ku pirsgirêkên danûstandinê dijîn,
- Xweîzolekirina giran, weşîna porê,
- Weneyên ku di çalakiyên perwerdehiyê de xwe didin der,

- Bertekên hestî yên zarokan ên gava ku mamoste derbarê qonaxê danûstandinê dikin, xwe didin der,
- Qonaxa pevçûnê ku di bîranînên zarokan de gelekî cih digire,
- Çavdêriya wê ku şiyana vegotina hestan li gor qonaxa berî pevçûnê bi paş ketiye,
- Hestyarî û nerehetiya zarokan li hember dengê bilind,
- Kêmbûna eleqeya çalakiyên civakî û dibistanê,
- Rewşa ku mijara lîstik û çalakiyên din bêhtir şer û şidet be û hwd.

Gava daneyên vê raporê (Bnr. I-2. Bandora Pevçûnên Çekdarî li Zarokan) bên nirxandin ne xelet e em bêjin zarokên mijara xebatê serboriyên trawmatîk jiyane.

> "Bo mînak, ez bîranîneke xwe ya derbarê dersê ji we re bejim. Min gotibû serpêhatiyeke xwe ya ku demek nêz an berê hatiye serê we binivîsin. Min dît ku serpêhatiyên xwe yê dema qedexekirinê dixwînin û gelek jê gava ev serpêhatî tên xwendin digirîn. Wisa lê hat ku ev xebat veguhêzî rewşeke trawmatîk. Gava em bêjin serpêhatî dibe ku geşt û seyran an bûyereke cuda ya berê bê bîra me. Lê ez qet nefikirîbûm ku ewqas kes nemaze dema qedexekirinê binivîsin, bînin zimên"

Bandora trawmatîk a li zarokan a qonaxê, bo sazgehên civakî yên sivîl ku di vê qadê de dixebitin ewqasî berçav bûbû ku tê dîtin, sazgehên bo piştevaniya zarokan ên hatibûn girtin ji nû ve vebûne û dest bi xebatên bo piştevaniya zarokan kirine. Beşdaran gotiye herçiqasî ji ber zordariyê xebatên sazgehî zehmet bûn jî di vê qonaxê de piştevaniya zarokan berî her tiştî tê û bo vê jî sazgehên xwe dîsa çalak kirine û bo zarokan dest bi xebatên xwe kirine.

> "....û li wir danûstandineke wisa hebû ku xabata 15 salan a bi malbatan re ew pêk anîbû û gotin: we sazgeh girtin lê rastî jî cihekî ku zarok lê bilizin tune ye, rewşa zarokan ne baş e û pê re jî dest bi vegotina bandorên bernameyên zarokên xwe kirin. Ên ku neynûkên xwe dixwin, di xew de dihilçenin, ên naxwazin biçin dibistanê, qîzên zarok ku dixwazin dev ji dibistanê berdin û bizewicin û hwd... A rastî me fêm kir ku divê derbarê vê, derbarê başkirina vê rewşê xebat bên kirin. Ji ber vê jî me xwe saz kir û di xebatên xwe de başbûna zarokan kir armanc."

Trawmaya derûnî ew e ku şêwejiyaneke nû zererê bide çerxa jiyanê ya takekesan û hevsengiya wan a jiyanê. Ji ber vê jî di piraniya bernameyên midexaleyê yên bo kêmkirina bandora trawmayê de armanc ew e ku takekes li jiyana xwe vegerin û bo serederîkirina bandorên trawmayê bên xurtkirin. Di vê xebatê de tê dîtin ku xebatên beşdaran ên bo zarokan van armancan vedihewînin. Nûnerên hin saziyan yên ku tevlî xebatê bûne, gotiye me bo "şiyanên jiyanê" modûlên perwerdehiyê yên alîkar û

bernameyên kargehê li dar xistine û bi vê rêyê xwestiye li gel kêmkirina bandorên trawmayê bo serederîkirina wê jî zarok bên bihêzkirin. Ev armanc dikare wekî rengvedana wê arezû û hişmendiyê bê nirxandin ku mirov jiyaneke wisa zehmet û bandora wê demdirêj “hîn bibe û bi wê bijî”, “li gel vê yekê jiyana xwe bidomîne”.

**Armanca me ya sereke ew bû ku di mijarên pêwist de bi mebesta domdariya jiyanê bêyî ku di trawmayên xwe de asê bimînin piştevaniya zarokên dûçarî trawmayên bikin. Dibe ku ev piştevaniya derûnî be an piştevaniya qadên geşedanê. Bihêzkirina wan û xurtkirina şiyanên jiyanê. Kurtearmanca xebatên me ev e.**

> “...Ji aliyekî ve jî meseleya trawmayê gelekî cidî ye. Her gav em wisa bi rehetî behsa ‘bandorên trawmayê, rizgarbûna ji bandorên trawmayê’ dikin, lê ya rastî em hemû baş dizanin, trawmaya şer ne ew trawma ye ku tu mirov bikaribin ji ser xwe biavêjin, bo zarokan jî wisa ye. Ji ber vê, girîng e ku zarok hîn bibin bê dê çawa bi wê trawmayê bijîn, çawa serî pê derxin û van şiyanên xwe yên jiyanê geş bikin.”

Taybetmendiyek ji lîteratûra trawmayê ya herî hêja ew e ku me derbarê trawmayên piralî hişyar dike û agahiyên berfireh pêşkêş dike. Serboriyên trawmatîk carina bi rudanakê tenê sînordar namînin û weke wan serboriyan rû didin ku em dikarin piralî an zincîreyî bi nav bikin. Nemaze pevçûnên çekdarî, koçkirina bi darê zorê, koç ew bûyer in ku dibin sedema trawmayên piralî. Pevçûn mirovan ji cihê wan dûr dixe û koçê bi xwe re tîne. Ev jî dibe sedem ku li gel bandorên pevçûnê cihê xwe, çanda xwe, mirovên ku bi wan re dijîn û ya rastî parçeyekî ji nasnameya xwe li pey xwe bihêlin û trawmayên giran bi wan re bidin der. Di qonaxa pevçûnê ya mijara vê lêkolîne de, gelek malbat mecbûr mane malê xwe biterikînin û koçî bajarekî an navçeyeke din bikin an jî di nav heman bajar/navçeyê de cihê xwe biguherin. Beşdarên lêkolîne aniye zimên ku derbarê koça bi zordarî ya girêdayî pevçûnan û bandora koçê ya li zarokan baldariya wan hebûye. Hema bêje hemû beşdaran gotiye; ji ber ku berî 2015an derbarê kampa êzîdiyan, tevgera nifûsê ya girêdayî Şerê Suriyeyê û koçkirina bi darê zorê ya salên berê û valakirina gundan, di vî warî de xwedî tecribeyeke giştî ne. Hin beşdaran gotiye me xwestiye di xebatên xwe de bandora vê koçberiyê ya li zarokan daxin asta herî kêm.

> “Em bi malbatên wan zarokan re xebitîn ku ji cihên pevçûna giran reviyane û li vir bi cih bûne . Me xwest bandora serboriyan daxin asta herî kêm.”

> “Em bi wan malbatan re xebitîn ku ji taxên xwe koç kirine. Berî her tiştî me xwest bo zarokên dûçarî tarwmayê piştevaniya psîkososyal bikin. Bi kargehên hunerê alîkariyê bikin ku zarok geş bibin, bixwebarweriya wan zêde bibe, di danûstandinê de şiyana civakî xurt bikin û ji hêza hunerê ya sazkar sûd werbigirin.”

## III-1.1.2. Xwegihandina Hunerê

Beşdarên lêkolînê diyar kiriye ku gava armanca xebatan nişan kirine di warê xwegihandina hunerê de nemaze bandorên bidezavantajiyê kirine navend bo xwe. Di vê çarçoveyê de, wan ji aliyekî ve xwestiye xwe bigihînin herêmên dûrî bajêr û zarokên gundan û bi rêya hunerê piştevaniya wan bikin û ji aliyekî ve xwe bigihînin wan zarokan ku li bajêr dijîn lê ji hin hêlan ve (bikaranîna madeyan, serpêhatiyeke şidetê, jiyana li kolanan û hwd) di talûkeyê de ne. Beşdaran bi sedema ku dizanin xwegihandina zarokan zahmet e, gotiye, divê bo xebatan bi zarokan re plansaziyek jî bê kirin. Di vê çarçoveyê de hin rêxistinên civakî yên sivîl, bo xebata piştevaniya psîkososyal a bi zarokan re çûne gundên zarokan û xebatên xwe li wir kirine.

Yek ji armancên sereke a van hemû xebatên mijara lêkolînê ew e ku di bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal de huner bi awayê amûreke girîng bê bikaranîn. Ew jî vê nîşan dide ku hewla beşdaran a bo xwegihandina zarokên herêmên dûrî bajêr di cih de ye. Lewra zarokên li van herêm/taxan li gel ku mîna zarokên bajêr di bin bandora neyînî ya pevçûnan de mane, ne xwedî wê derfetê ne ku beşdarî çalakiyên hunerî an çalakiyên rêxistinên civakî yên sivîl ên bo zarokan bibin.

> "Ev ew zarok bûn ku pêlîstokên wan nebûn û nikarîbûn di nav malbatê de xwe îfade bikin. Me xwest di qadeke azad de, ji hindikayî ve xwe bigihînin materyalan jî û çawa bêjim bikaribin hin tiştan bikin û hestên xwe derbirînin."

> "Ez bi wan zarokan re xebitîm ku di nav malbatê de şidet li wan dibû, li kolanan dijîn. Ew rê dîtine ku bi serê xwe bijîn û heq ji xwe derkevin. Min di vê xebatê de tenê xwest ku wan qane bikim bi wê ku huner jiyaneke alternatîf e."

## III-1.1.3. Avakirina Qadên Ewle

Bandoreke din a pevçûnên parêzgehên mijara lêkolînê ya li zarokên li van bajaran ew e ku qadên ewle yên bo jiyana van zarokan, hatibûn hilweşandin û êdî nikarîbûn bên bikaranîn. Di vê qonaxê de hem qedexekirinên derketina kolanan hem pevçûnên ku li bajêr dom dikin, li gel ku zarok ji qadên lîstikê dûr xistine ew xistinê wê rewşê ku di malên xwe de jî xwe ewle hîs nekin. **Ji ber ku şert û mercên pevçûna giran an sivik (qedexekirinên derketina derve, hebûna hêzên ewlehiye li nav bajêr û kontrol û çavdêrîkirina domdar, talûkeya ku zarok li kolanan rû bi rû dibûn, rewşa ku malbat kolanan bo zarokên xwe ewle nabînin, talûkeya avêtiyên pevçûnê bo zarokan hwd) bo zarokan dibin asteng ku li kolanan azad û ewle bilîzin,** beşdaran bi rêbertiya mezinan zarok li cihê ewle anîne cem hev û xebatên xwe wisa kirine. Di vê çarçoveyê de, gelek beşdaran diyar kiriye ku pêdivî pê hebûye ku zarokan li qadên ewle bînin cem hev. Çalakiya ku zarok li cihên ewle kom kirine, xizmeta wê dike ku; zarokên dûrî hev ketine, ji ber rewşa siyasî dijberî hev bûne û rengvedanên vê, di jiyana rojanê de dijîn dîsa bigihînin hev û wê hîsa bihevrejiyanê ji nû ve saz bikin.

"...qada lîstikê pêdiviyek bû. Armanca min ev pêdivî bû."

"Tu kes dernediket kolanan, zarokên ku li kolanan dilîstin nebûn. Em jî wisa fikirîn ku ya bi zarok û mezinan re hevpar çi ye, çi dikare wan bigihîne hevdû? Lîstikên kolanan... Lewra zarokan jî lîstikên kolanan dixwestin, malbatan jî. Ev ji paşerojê mabû. Em weke qadeke hevpar lîstikên kolanan fikirîn."

## III-1.1.4. Piştevaniya Bixwebawerî û Serkeftina Akademîk a Piştî Rewşa Awarte

Di qonaxa pevçûnê de, rewşa herî bandorker a bajarên mijara lêkolînê ragihandina rewşa awarte ye. Bi rewşa awarteyê ku 21ê Temûza 2016an hat ragihandin sazgehên perwerdehiyê hatine girtin, gelek perwerdekar ji karê xwe hatine avêtin. Ev şert û mercên navborî bo zarokan bûne astengên cidî ku mafê perwerdehiyê bi dest bixin, herwiha van şert û mercan motîvasyona dewama dibistanê winda kiriye û perwerdehî têk biriye. Hin beşdarên lêkolînê aniye zimên ku bo jiholêrakirina vê kêmasiyê û piştevaniya geşedana akademîk a zarokan a di vê qonaxê de armancên xwe yên xebatê diyar kirine.

"Bo mînak, xwendekareke me yî gelekî serkeftî hebû. Ew xwendekar ji ber ku wê demê sazgeh hatin girtin, di qonaxa qeyûm û îxracan de bi serboriyên neyînî re rû bi rû ma û ket wî halî ku bêje perwerdehî bi kêrî tiştekî nayê û jiyanê pûç bibîne. Lewra ew mamostê ku gelekî hez jê dikir û bo wê rol model bû ji kar hatibû avêtin."

"Em di warê piştevaniya psîkososyal de hîn bêhtir bi qada akademîk bi serkeftina wan a dibistanê re eleqedar bûn. Ji ber ku vê qonaxê bandor li serkeftina zarokan a dibistanê jî kir. Em bo wê xebitîn ku li dibistanê xurt bibin."

## III-1.1.5. "Başkirina Xwebixwe..."

Beşdaran diyar kiriye ku di qonaxekê de wan jî ferq kiriye ku rewşa pevçûnê bandor li wan kiriye û wan ev xebat hinekî bo rûbirûbûna şahidiya xwe û serederîkirina rûbirûbûnê sewirandiye. Lewra ew wisa dinirxînin ku "kirina tiştekî nîşana wê ye ku jiyan hê jî berdewam e" û gava wan ev xebat bi rê ve birine xwe baştir hîs kiriye. Li gel vê rewşê, beşdaran diyar kiriye ku bi vê xebatê armancake wan ya din peyamek/bersivandineke bo rewşa siyasî. Wan ev peyam/bersiv wisa rave kiriye ku; ew hê jî hene, zimanê wan, nasnameya wan heye, tax, kolan û zarokên li vir yên wan in û ancax ew dikarin birînên xwe baş bipêçin.

"Ev rewşeke derûnî ye. Ber bi havînê me jî got 'em gelekî ji hêv ketin'. Em hemû bi hev re ewqasî felişîne ku... Baxçeyê me heye... Kî tê dibêje, 'baçeyekî we yî nûwaze heye', 'darên we yên fêkî hene' Lêbelê em ne di ferqa wî baxçeyî de bûn... Em ewqasî ji jiyanê dûr ketine. Me aliyên vê yên neyînî bi zarokan re jî bi malbatan re jî dîtin. Ji aliyekî ve tu dixwazî hewl bidî tiştekî baş bikî ji aliyekî ve rewşa derûnî ya mamoste yên xwe, malbata xwe nabînî. A rastî ev korerêyek e. Kargeha hunerê jî tam ji ber vê pêdiviyê ye..."

## III-1.1.6. Piştevaniya Bikaranîna Zimanê Zikmakî

Hema bêje hemû beşdaran bal kişandiye ser wê ku divê di xebatan de zimanê zarokan ê zikmakî bê bikaranîn. Li gel ku zimanê zikmakî carcar wekî amûreke xwegihandina zarok û dêûbavan, bo sazkirina baweriyê, nêzîkahiyê tê pênasekirin jî carcar wekî delîleke wê hatiye nîşandan ku başbûn û bihêzbûn ancax bi zimanê zikmakî pêkan e. Li gel ku beşdaran bi **zarokên zimanê wan ê zikmakî kurdî ye xebat bi kurdî** kirine, bi wan **zarokan re ku ji Suriyeyê koç kirine û bi kurdî û tirkî nizanin bi zimanê wan zarokan ê zikmakî xebatên erebî** jî kirine. Ji aliyê hin kes û sazgehan ku hevdîtin bi wan re hatiye kirin, bikaranîna kurdî di xebatan de wekî armancê hatiye pênasekirin.

"Armanceke me yî wisa hebû ku em li hember asîmîlasyonê zemîneke hunerî ava bikin da ku zarok xwe û çanda xwe bînin zimên û zarokên di bin bandora vê rewşa bipevçûn û talûke de hinekî baş bikin."

"Me di xebatên xwe de xwest ku zimanê zikmakî li pêş be. Lewra gelê herêmê bo kesên xebatan bi zimanê zikmakî dikin xwedî sempatî û germahiyêkê ye. Me ev di xebatên xwe de xweş dîtin. Hevalên alîkar hebûn ji bilî me, yek du derûnas û xebatkarên psîkososyal ku bi tirkî diaxivîn. Gava ew diaxivîn zarokan a dilê xwe nedidan der an jî bi temamî tevlî xebatê nedibûn. Ji ber vê, armanca me ya pêşî ew bû ku bo zarokên herêmê çalakiyan li dar bixin..."

"Me ji xebatên xwe yên berê zanîbû ku zarok girêdayî zimanê zikmakî hin qonaxên trawmatîk dijîn û ev bo nifşên din tên vegûhestin. Ji ber vê me got "zimanê zikmakî nebe, nabe" û bo ku bi awayekî sûd ji hunerê wergirin em xebateke duzimanî bikin. Lewra tecribeyeke me yî wisa hebû, li hin pêşdibistanan an jî hin dibistanên wekî dibistanên seretayî tenê perwerdehiya bi kurdî hatibû kirin. Çavdêriyên me yên derbarê vegotinên hevalên me yên beşdarê xebatê ew in ku mesele ne fêrkirina zimanekî ye. Di xebatan de armanca me ew bû ku em xwe û derdê xwe hêrî baş bînin zimên û wisa derbikevin pêşberî wan. Loma me xebata duzimanî kir. Ji ber ku girêdayî pergala perwerdehiyê ya Tîrkiyeyê hin zarok hebûn ku kurdî hîn nebûbûn û tenê bi çend peyv û gramera li gor dibistana seretayî bi kurdî diaxivîn, me zor li wan nekir. A girîng ew bû ku xwe îfade bikin."

> "Ji aliyekî ve jî me xwest ku xebatê bi wan hevalan re bi rê ve bibin ku zarok xwe li mala xwe hîs bikin, derdê xwe bêjin û wan nêzî xwe bibînin. Ji ber vê, ji du alîkaran yek jê tenê bi tirkî yek jê jî tenê bi kurdî axivî. Lêbelê armanca me ya sereke ew bû ku zarok ji aliyê derûnî ve baş bibin û hewl bidin ji hindikayî ve li gorî qeweta xwe serî bi wan trawmayan derkevin ku di hevdîtinên malbatên zarokan de hatibûn tesbîtkirin."

## III-1.2. Destnîşankirina Rêbazên Xwegihandina Zarokan û Zarokên ku dê Xebat bo Wan Bê Kirin

Di vê beşê de, bi beşdaran re hatiye axaftin bi dê kîjan zarokan bi çi mebestê tevlî xebatê bikin. Beşdaran diyar kiriye ku hemû zarok di bin bandora pevçûnê de mane lêbelê ji ber butçeya sînordar û kapasîteyê, bo xebatan pêşikî daye hin komên zarokan. Di vê çarçoveyê de hin agahiyên derbarê bijartina zarokan li jêr hatine diyarkirin.

### III-1.2.1. Kîjan Zarok û bo Çi?

Gava em li krîterên tevlîkirina xebatan ên beşdaran dinêrin, tê dîtin ku bo hemû beşdaran krîtera sereke ew e ku **qonaxa pevçûnê bandor li zarokan kiribe**. Lêbelê ew a ku hema bêje hemû zarokên li bajaran bi awayekî neyînî di bin bandora pevçûnê de mane û sînordariya şert û mercên xebatê, kiriye ku beşdar li gorî hin krîteran, di warê xebatê de pêşî cih bidin komên zarokan en cuda. Hin perwerdekarên hunerê û nûnerên sazgehên hunerê yên hevdîtin pêk anîne, ragihandiye ku ne wan zarok hilbijartine, rêxistinên qada xebatên derbarê zarokan, zarok diyar kirine û di vî warî de ew berhêlî kirine. Agahiyeke din a derbarê hevdîtinan ew e ku hin sazgeh piştî qonaxa pevçûnê hatine damezirandin û ji ber ku armanca damezirîna van sazgehan xebatên bo zarokên di bin bandora pevçûnan de ne, nemaze li cihê pevçûnan dest bi çalakiyên xwe kirine. Vê jî ew bi xwe re aniye ku rasterast zarokên di bin bandora pevçûnan de tercîh bikin. Bi heman awayî kesên berê di vî warî de nexebitîne jî piştî pevçûne, pêdiviya zarokan dîtine û xebatên takekesî plan kirine û bi rê ve birine.

Tê dîtin ku derbarê tevlîkirina zarokan bo xebatê (kîjan krîter û bo çi) sê krîter derdikevin pêş: **Nêzîkayiya fizîkî û nasîtî, dezavantaja civakî-aborî û pêdiviya piştevaniya zarokan a bi awayê takekesî**. Li gel van krîterên tevlîkirina zarokan bo xebatê bi rewşa kes an sazgehên rêvebir re jî têkildar e.

#### *III-1.2.1.1. Nêzîkayiya Fizîkî û Nasîtî*

Hin beşdarên lêkolînê di qonaxa biryargirtinê de bê dê kîjan zarokan tevlî xebatê bikin; diyar kiriye ku zarok û dêûbav ji aliyê fizîkî ve nêzî wan in û minasebeta xebatên xwe yên berê wan nas dikin an jî ji ber ku li heman taxê dimînin nasîtiya wan heye û bo xebatê ew tercîh kirine. Sedema vê tercîhê ku têkildarî rewşa siyasî ya bajêr e jî di nav wan agahiyan de ye ku beşdaran ragihandiye. Beşdaran diyar kiriye

ku piştî pevçûnê tirsa dêûbavan a derbarê zarokên wan zêde bûye û ji ber vê, derbarê tevlîkirina zarokan bo xebatê û sazkirina baweriyê bi dêûbavan re pirsgirêk hatine dîtin. Lêbelê beşdaran ragihandiye ku gava ji heman taxê bin, bi dêûbavan re bi zimanê wan danûstandin kiribin û berî pevçûnê jî li taxê xebat kiribin ev bo sazkirina baweriyê gelekî sûdwer bûye. Beşdarên bi serê xwe xebat kirine diyar kiriye ku tercîhkirina komên nêzikayiya fizîkî û nas hema bêje mecbûrî bû.

> "Min zarok ji wan taxan hilbijartin ku nasên min li wan hebûn. Mirov baweriyê bi kesekî ji derve nayîne loma min di danûstandinê de zehmetî kişand, ez mecbûr mam ku zarokan ji wan cihan hilbijêrim ku min an dê û bavê min nas dikin."

Di hevdîtinan de krîtera nêzîkayiya fizîkî û bandorkeriya pevçûnê bo hin rêxistinên civakî yên sivîl bi awayekî sirûştî ketiye nav hevdû. Van rêxistinên ku bi salan e derbarê zarokan xebat kirine, ragihandiye ku cihê pevçûna 2015-2016an ew tax in ku berî pevçûna giran xebat lê dikirin û piştî pevçûna giran jî çalakiyên xwe li wir kirine. Vê rewşê jî derfet daye wan ku bi wan zarokan re bixebitin ku pevçûnê bandor li wan kiriye. Ev rewş ji aliyê wan kesan ve jî hatiye ragihandin ku bi serê xwe li cihên şer û pevçûnê xebat bo zarokan kirine.

> "Ji zû ve, berî pevçûnê jî me bo zarokan xebatên birêkûpêk li dar dixistin. Di qonaxa pevçûnê de derfeta me nebû ku em bi zarokan re bên cem hev, ji ber ewlehiyê. Ewlehiya me û ya zarokan... Di qonaxên paşê de jî gava em bi zarokan re hatin cem hevdû me dît ku zarok gelekî bêdeng bûne, di derbirîna hestên xwe de zehmetiyê dikşînin û me xebatên xwe li gor van zarokan saz kirin."

> "Ji Adar-Nîsana 2016an pê ve dîsa me li heman taxê dest bi xebata xwe kir. Jixwe hemû zarok bûn ku pevçûnê bandor li wan kiribû."

> "Me zarokên di bin bandora pevçûnê de ne ku bi veguhastine an bi awayê ku ji cihên cuda bên; ji ber ku ew ji jîngeha me bûn, tercîh kirin. Em hem di warê diyarkirina pêdiviyên wan de bişens in hem jiyana di nav girseya armanc de xwegihandina zarokan hêsan dike."

> "Min xebat li dibistana xwe kir. Min zarok ji nav xwendekarên xwe hilbijartin."

*III-1.2.1.2. Dezawantaja Civakî-aborî*

Krîtereke din a bo hilbijartina zarokan ew bû ku ji aliyê civakî-aborî ve bidezawantaj bin. Gava em li nêrînên beşdaran ên derbarê vê dinêrin, em dibînin ku ew rewşa bidezawantaj a civakî-aborî bi rewşên mîna; **hejarî, dûrbûna ji navenda bajêr, bicihbûna wan deran ku çalakiyên civakî yên sivîl kêm in, kêmayiya asta perwerdehiya dêûbavan û hermonîkirina ji ber nasnameyeke olî ya cuda**tê pênasekirin. Ji ber ku derfeta van zarokan nîne bi serê xwe tevlî xebatên hunerê bibin, di xebatan de pêşî ev zarok hatine tercîhkirin.

> “Komeke din a ku min dixwest pê re bixebitim zarokên malbatên êzîdî bûn ku li navçeyeke din rûdiniştin. Lewra ew hem dûçarî zordariya hevsalên xwe dibûn hem li qeraxa hermonîkirina civakî bûn.”

> “Me xebata xwe li taxeke bajêr a hejar bi zarokên dibistana seretayî re kir. Li vir qonaxa pevçûnê gelekî bandor li wan nekiribû a rastî, lewra li wir pevçûn ne giran bû û loma me ew zarok hilbijartin ku ji aliyê civakî-aborî ve derfetên wan kêm in”

> “Em hewl didin bêhtir bi komên bi dezawantaj re bixebitin. Weke hûn dizanin ev der parêzgeheke ku gelek koçber têne û me xwest bi zarokên koçber re bixebitin.”

> “Gundê min xebat lê kir ji aliye aborî ve gelekî lawaz bû; derfeta karûbar nebû, bav di înşaatan de dixebitîn û zivistanê karekî wan ê birêkûpek nebû. Gundekî wisa bû ku gelek zehmetî hebûn, şidet li dor bû, dê û bavan hevdû berdida û zordariya li hember jinan hebû.”

> “Di wê qonaxê de profîleke me ya diyar hebû. Malbatên ku pêdiviya wan bi alîkariya aborî hebû û zarokên wan... Berî her tiştî ew bo me girîng bûn.”

*III-1.2.1.3. Pêdiviya Piştevaniya Taybet bo Zarokan*

Di diyarkirina zarokan de, pêdiviya piştevaniya zarokan bi awayê takekesî a wekî krîterekê, rebazek bû ku nemaze mamosteyên bi serê xwe dixebitin, bi kar dianî. Sedemek ji vê ew bû ku mamosteyan dikarîbûn zarokan ji nêztir ve bibînin û bi wî awayî zarokên pêdiviya wan bi piştevaniya psîkososyal heye rehettir hilbijêrin. Hin beşdarên ku pirsgirêkên takekesî bo hilbijartinê wekî krîterekê qebûl kirine, hebûna wan zarokan nîşan daye ku **di polê de pirsgirêkên hevahengiyê** dijîn. Li gel vê, wan **ew zarok tevlî xebatan kirine ku di polê de serkeftina wan a akademîk guheriye an**

**jî pirsgirêkên reftariyê yên giran nişan dane** û di ser de bo piştevaniya van zarokan bernameyên taybet pêk anîne.

> "Ez wî çaxî bi xwendekarên pola destpêkê re dixebitîm û pirsgirêka ku herî zêde derdiket pêşberî me hevahengî bû. Min ji xwendekarên pola destpêkê ji çar polen cuda xwendekar hilbijartin ku pirsgirêka hevahengiyê bi wan re heye. Hin ji van zarokan bêpergaliyên danûstandinê jî nişan didan"

> "Gava min yek bi yek zarok diyar kirin, min ji hevdîtinên takekesî yên bi zarok û mamosteyan re sûd wergirt. Bo mînak, zarok hîperaktîf e an pirsgirêkeke malbatî heye û ev zarokan tengezar dike, min ev zarok hilbijartin bo xebatê"

## III-1.2.2. Rêbazên Xwegihandina Zarokan

Di vê merhaleya lêkolînê de bo wê hewl hatiye dayîn ku beşdaran bi kîjan rêbazê xwe gihandiye zarokan û di vê qadê de çi tecribe kirine. Agahiyên ji beşdaran bidesxistî didin nîşan ku bo xwegihandina zarok û dêûbavan gelek rêbaz hatine bikaranîn. Du rêbazên ku beşdaran bi piranî li ser wan li hev kiriye û herî zêde bi kar anîne; serdena malan û agahdarkirina dêûbavan û xwegihandina bi rêya têkiliyên takekesî û rêbazên din in.

### *III-1.2.2.1. Serdana Malan û Agahdarkirina Dêûbavan*

Serdana malan ew rêbaz e ku bo xwegihandina girseya armanc û gelek caran ji bo diyarkirina pêdiviyên girseya armanc hem di xebatên piştevaniya psîkososyal hem di xebatên qadê de gelekî tê bikaranîn. Di vê lêkolînê de hin beşdaran hem bo xwegihandina zarokan hem bo agahdarkirina zarok û dêûbavan a derbarê xebatê, rêbaza serdana malan bi kar aniye. Lêbelê ji aliyekî ve jî serdana malan rêbazeke zehmet e. Îhtîmal e xebatkarên qadê ji ber ku malbatan nas nakin bo serdanê xeberê bidin wan û di warê erêkirinê de hin zehmetiyan bikşînin. Tê dîtin ku beşdarên vê lêkolînê bo serîpêderketina vê zehmetiyê bi muxtaran re, bi konseya bajêr a parêzgehê re, bi şaredariyan re û bi rêxistînên civakî yên sivîl re -yên ku kes/dêûbavên ku dixwazin xwe bigihînin wan nas dikin- hevkarî kirine. Li gel vê beşdaran, di vê qonaxê de bi rêya dêûbavên zarokan û bi rêbaza goka berfê xwe gihandine yên din.

Li gel ku xwegihandina dêûbavan bi rêya serdanê wekî rêbazekê gelekî hatiye bikaranîn, hin beşdaran gotiye ku serdana malan gelekî zehmet e. Beşdarekî ji qada xizmeta civakî ragihandiye ku ev rêbaz piştî demekê bo dêûbavan û loma ji bo zarokan pirsgirêkan derdixe holê. **Li Diyarbekirê û parêzgehên din demekê gelek rêxistinên civakî yên sivîl li deriyê dêûbavan daye, ji wan agahî xwestine û vê jî baweriya wan kesan şikandiye û ew bêzar kirine.** Li gor beşdaran sedema vê bawerşikestinê ew e ku ji hevdîtinan gelekî hêvî kirine lê xebat nehatine destpêkirin an berdewamkirin. Lêbelê piştevaniya rêxistinên heremî yên cuda û ew a ku carina dêûbavan jî bi

beşdaran re serdana yên din kiriye, bo agahdarkirin û erêkirinê ji rêvebirên xebatê re bûye alîkarî û sazkirina baweriya dêûbavan hêsan kiriye ku serdana wan hatiye kirin.

> “Piştî qonaxê malbat bitirs bûn. Tu kî yî, çi yî, vê xebatê bo çi dikî, tu dê zaroka min bibî ku derê?.. Ev hin pirs bûn ku ji me dikirin. Ji ber vê, di serî de hevalê min ê mamoste alîkariya min kir. Ez li filan dibistanê dixebitim, filan tiştî dikim. Ev agahî dan wan. Piştî demekê bawerî bi min anîn. Me berî vê hejmara telefonên hemûyan stand, ew agahdar kirin û daxwaza wan bi cih kir.”

> “Me di hevdîtinan de malbatek jî bi xwe re bir. Hebûna vê malbatê bawerî da yên din jî. Dawiyê bawerî bi me anîn û zarokên xwe teslîmî me kirin.”

> “Me 2-3 hevalan bo malbatan hin tax diyar kirin û em çûn wan deran me hevdîtinên rû bi rû pêk anîn û xwe da nasîn. Me ji wan re got ku em kî ne, armanca me çi ye û em li ku derê dixebitin. Yanî armanca me ew bû ku em baweriyê saz bikin. Ji ber ku em bi şaredariyê re çûbûn û baweriya wan bi şaredariyê hebû, ev di xebatên me de bo destûra malbatan jî bû alîkar.”

> “Me formek amade kir bo agahiyên malbatan. Gava em çûn serdanê jî me ew kesên ji şaredariyê bi xwe re birin ku berê bi malbatan re danûstandina wan hebû û bawerî bi wan anîbûn. Bê bi kîjan zimanî rehet bûn em jî bi wî zimanî axivîn. Ji wan jî gelekan jê kurdî, çend malbatan jî tirkî tercih kir”

Hinek ji beşdaran jî gotiye me jî rêbaza serdanê bi kar aniye lê derbarê danûstandin û baweriyê rastî tu pirsgirêkan nehatine. Taybetmendiya wan kes û sazgehên ku di danûstandina bi malbatan re rastî pirsgirêkan nehatine ew e ku ji zû ve ye li wê herêmê/taxê xebitîne û ji aliye mirovên wir ve tên nasîn.

> “Qenebe ev 13 sal in em li vir dixebitin. Malbat me dinasin em jî wan nas dikin. Em û nifşên berê jî hevdû dinasin, niha zarokên wan zarokan li wir in ku di zarokatiyê de me hevdû nas kiribû. Loma jixwe baweriya me bi hevdû hebû, lê dîsa jî berî xebatê em yek bi yek serdana malbatan dikin. Em hem derbarê xebatê wan agahdar dikin hem dixwazin hevkariya wan hîn bibin. Di vê xebatê de jî me wisa kir.”

### *III-1.2.2.2. Xwegihandina bi Rêya Têkiliyên Takekesî û Rêbazên Din*

Beşdaran bo agahdarkirina malbatan hin rêbazên din jî bi kar anîne. Yek ji wan jî ew e ku li gund û taxan serî li dost û hevalên xwe dane. Nemaze beşdarên ku di hevdîtinan de ev rêbaz bi kar anîne, bal kişandiye ser wê ku bi dêûbavan re danûstandina

TABLO 1: Tabloya Kurteya Xebatên Amadekariyê

<table>
<tr><td rowspan="6">III-1.1. Diyarkirina Armanca Xebatan</td><td colspan="2">Kêmkirina bandora trawmayê</td></tr>
<tr><td colspan="2">Xwegihandina hunerê</td></tr>
<tr><td colspan="2">Avakirina qadên ewle</td></tr>
<tr><td colspan="2">Piştevaniya bixwebawerî û serkeftina akademîk a piştî rewşa awarte</td></tr>
<tr><td colspan="2">“Başkirina Xwebixwe ...”</td></tr>
<tr><td colspan="2">Piştevaniya bikaranîna zimanê zikmakî</td></tr>
<tr><td rowspan="5">III-1.2. Destnîşankirina Rêbazên Xwegihandina Zarokan û Zarokên ku dê Xebat bo Wan Bê Kirin</td><td rowspan="3">Kîjan zarok û bo çi</td><td>Nêzîkahiya fizîkî û nasitî</td></tr>
<tr><td>Dezavantaja civakî-aborî</td></tr>
<tr><td>Pêdiviya piştevaniya taybet bo zarokan</td></tr>
<tr><td rowspan="2">Rêbazên xwegihandina zarokan</td><td>Serdana malan û agahdarkirina dêûbavan</td></tr>
<tr><td>Xwegihandina bi rêya têkiliyên takekesî û rêbazên din</td></tr>
</table>

wan bûye û têkilî li ser baweriyê ava bûye. Beşdaran ragihandiye ku di warê xwegihandina zarokan de hem rasterast tekilî bi dêûbavan re danîne hem bo bangewaziyê rêbazên cuda bi kar anîne. Bo mînak, hin beşdaran hewl daye li taxan bi rêya muzîkê bala mirovan nemaze zarokan bikşînin, hinek beşdarên din jî hewl daye bi rêya malper û kanalên tora civakî bangewaziyê bikin û bi vî awayî bala zarokan bikşînin.

> “Jixwe em li taxê bi malbatan re di nav hevdû de bûn. Pêdivî hebû lê tiştekî ku bikin nebû. Zarok ji sibehê heta êvarê li nav taxê ji xwe re diçûn û dihatin. Tiştekî ku bikin nebû, kesên li taxê jî zanîbû pêdivî bi vê heye û ya rastî alîkarî jî kirin.”

# III-2.
# QONAXA SEPANÊ

Di vê beşê de dê agahiyên qonaxa sepanê cih bigirin û derbarê; çalakiyên qonaxa sepanê, cîhê xebatên hunerê di çalakiyan de, xebatên hunerê yên hatine kirin, plansaziyên berî sepanê, qonaxa beşdariya dêûbavan bo xebatan û zehmetiyên qonaxa sepanê bi sernivîsên diyar kurtenirxandinek bê kirin.

## III-2.1. Plansaziyên Berî Sepanê

Gava em li agahiyên ji beşdaran bidesxistî dinêrin, tê dîtin ku berî sepanê di mijarên diyar de plansazî û amadekarî hatiye kirin. Li gel ku bo hemû beşdaran qonaxa destûr/erêkirinê di xebatan de cih girtiye hin kirariyên mîna bihêzkirina beşdaran û plansaziyê di hin xebatan de cih negirtiye. Li jêr derbarê plansaziyên berî sepanê agahî tên pêşberkirin.

### III-2.1.1. Destûr, Erêkirin û Agahdarkirin

*III-2.1.1.1. Erêkirina Dêûbavan*

Erêkirina dêûbavan a nivîskî û devkî yek kiryarî ye ku divê berî birêvebirina xebatên bo zarokan bê kirin. Di beşa berî vê de agahdariyên derbarê xebatê û xwegihandina dêûbavan hatin nirxandin, beşdaran diyar kiriye ku piştî sazkirina bawerî û dilxwaziya dêûbavan wan erêkirina dêûbavan a devkî û nivîskî xwestiye û ev bi cih aniye. Di vê qonaxê de hin sazgeh/kesan formên erêkirinê yên nivîskî bi kar anîne, hinekan ji wan jî bi alîkariya nasîtiya berê û baweriyê tenê erêkirina devkî xwestiye. Hemû beşdaran ragihandiye ku zarok jî hatine agahdarkirin û erêkirina wan devkî bûye.

> “Ji ber ku malbatê erê nekiribû me tu zarok tevlî xebatê nekirin. Me ev bi awayê ewraqekê ji wan wergirt. Rapirsîneke me hebû. Me li pişt wê ‘Hûn dixwazin beşdar bibin?’, ‘Erê’, ‘Heke hûn dixwazin hûn dikarin hejmara telefona xwe binivîsin û îmzê bikin?’ nivîsî. Bi vî awayî me tiştekî fermî bi dest xist. Divê em xwe ji hin tiştan biparêzin jî.”

> “Formên destûrê di destê me de hene. Piştî ku me nexşerêya xwe ya derbarê ewlehiya zarokan nivîsî, me bo hevdîtina zarok û malbatan hin form saz kirin. Jixwe qada me diyar e. Loma em pêşî bi zarokên qadê re hevdîtinan dikin, destûrê ji wan dixwazin û piştre bi hevdîtinên rûbirû ji malbatan jî destûrê dixwazin û dest bi xebatên xwe dikin.”

### *III-2.1.1.2. Qonaxa Destûrê ya Sazgehên Fermî*

Erêkirin û destûra sazgehên fermî li dibistanan, di xebatên mamosteyan de tê xuyakirin. Erêkirina xebatên li dibistanan li cihê sazgeh û kesên rêvebir bi destê mamosteyan pêk hatiye.

> "Gava me girseya armanc diyar kir me hem ji Rêveberiya Perwerdehiya Neteweyî ya navçeyê destûrên pêwist xwestin hem li wan dibistanan dixebitîn ku Rêveberiyê diyar dikirin."

Li dibistanan, bo xebatên li polê hin beşdaran ragihandiye ku di xwegihandina dêûbavan de zehmetî kişandine û ji ber vê berî xebatê ji hin dêûbavan destûr wernegirtine lêbelê bi rêya zarokan xwe gihandine dêûbavan û gava ew hatine dibistane bi hûrgulî agahî bo wan dane û bi vî awayî qonaxa erêkirinê pêk aniye. Li gor wan sedema vê ew e ku zarok bi pergala perwerdehiya veguhêzer diçin dibistanê û dêûbavên wan bi zehmetî ji gund tên dibistanê.

> "Heta niha tenê min xwe gihand du malbatan, ew jî du malbat bûn ku tesadif min ew li hewşa dibistanê dîtin. Mamosteyê wan ê polê bixwe jî ev 3 sal bûn ku qet malbat nedîtibûn. Dibistanên ku li wan dixebitim daxilî pergala veguhêzer bûn û piraniya zarokan ji gundên cuda dihatin, loma dayikên wan telefon bi kar nedianîn an nedihatin dibistanê, me di danûsitandina malbatan de gelekî zehmetî dîtin, danûstandin gelekî zehmet bû. Me, mamoste, zarok û ez, di vê xeleka sêgoşeyî de danûstandin pêk anî.

### *III-2.1.2. Xurtkirina Sepaneran*

Berî xebatên bo zarokan xebatên amadekariyê jî hebûn. Yek ji wan jî ew bû ku sepaner û dilxwazên xebatê bên xurtkirin. Lêbelê wekî ku li jor jî hat gotin hemû sazgehan xebatên xurtkirinê pêk neanîn. Gava agahiyên beşdaran bên nirxandin tê dîtin ku xebatên xurtkirinê bi awayê; perwerdebûn, beşdarbûna kargehan, supervîzyona hevsalan û agahdarkirina derbarê xebat û rêgezê sazgehê hatine birêvebirin.

Li gor agahiyên beşdaran berî destpêkririna xebatê di mijarên;

- Xebatên lixwenêrîna derûnî,
- Agahdarkirina dilxwazan derbarê xebatê,
- Xebata bi zarokan re,
- Sepana bernameyan,
- Rêbazên alternatif ên perwerdehiyê,

- Oryantasyoneke têkildarî xebatên komeleyê, xebata komî,
- Ewlehiya zarokan/polîtîkaya parastinê,
- Îstîsmar û îhmala zarokan de perwerdehiyên xurtkirine hatine lidarxistin.

Herwiha hin beşdaran aniye zimên ku di qonaxa hemû xebatê de bo rêvebiran alîkariya supervîzyonê daye. Di navnûnerên sazgehan û pisporên xebatên takekesî de ku hevdîtin kirine 16an jê diyar kiriye ku tevlî Bernameya Xebatên bo Zarokan a Komeleya Anadolu Kulturê bûne. Di tablo 2yê de perwerdehiyên rêvebiran yên berî xebatê hatine rêzkirin.

TABLO 2: Perwerdehiyên ku Beşdaran Berî Xebatan Dîtine

| | |
|---|---|
| Perwerdehiyên Hunerê | • Perwerdehiya pedagojiya muzîkê<br>• Fotoxraf<br>• Anîmasyon<br>• Drama û dramaya afirîner<br>• Kargeha heriyê<br>• Kargeha çêkirina kuklayan<br>• Perwerdehiya hunerê ya Wezareta Perwerdehiya Neteweyî (MEB)<br>• Wênexêzî<br>• Çîrokbêjî |
| Perwerdehiyên Din | • Perwerdehiya piştevaniya psîkososyal<br>• Perwerdehiya terapiya hunerê<br>• Perwerdehiya trawmayê û xebata bi zarokan re<br>• Kargeha zayenda civakî<br>• Perwerdehiya îstîsmara zarokan |

## III-2.1.3. Çalakiyên Sereke û Amûrên Hunerê yên Hatine Bikaranîn

Di hevdîtînan de, hewl hatiye dayîn ku çalakiyên sereke yên beşdaran û bikaranîna cureyên hunerê ya di van çalakiyan de bê fêmkirin. Hemû beşdaran ragihandiye ku huner wekî amûrekê bi kar aniye. Hatiye diyarkirin ku bernameyên piştevaniyê yên bo serkeftina akademîk jî çalakiyên hunerê vedihewînin. Di vê qonaxê de çalakiyên xebatê yên sereke ev in: **Kargehên fotoxraf û vîdeoyê, kargeha anîmasyonê, kargeha wênexêziyê, kargeha peykersaziyê, xebatên bi heriyê û kargeha peykersaziya ji kereseyên avêtî, xebatên dansên nûjen, kargehên şanoyê, xebatên dramaya afirîner, çîrokbêjî, xwendin û dramatîzekirina çîrokên kurdî; sêwirandina xişran, çêkirina tiştên ji kulavan, çêkirina pêlîstokan, kargeha veçerxînê, kargeha boyaxkirina textikan, boyaxkirina keviran, çêkirina boyaxê, kargeha maskeyan û kargeha orîgamiyê; kargeha sînemayê, temaşekirina fîlman, lidarxistin û beşdarbûna mîhrîcanan, komên muzîkê (erbane, gîtar), kargeha ritmê ya xwezayî, xebatên koroyê, koroya zarokan ya pirzimanî, xebatên edebiyatê.** Di tablo 3yê de ew amûrên hunerê hatine rêzkirin ku beşdaran di xebatên xwe de bi kar anîne.

Gava li çalakî û amûrên hunerê yên têkildar bê nêrîn, tê dîtin ku gelek sazgeh û kesan li cihê ku amûrekê tenê bi kar bînin gelek amûrên hunerê tercîh kirine. Bo mînak, gava armanca wan ew be ku ji kereseyên avêtî tiştan çêbikin jî, beşdaran di destpêka çalakiyan de bo lêgermbûn û motîvasyona xebatê ya zarokan bi amûrên mîna muzîk û dansê çalakî kirine û gava motîvasyona xebatê ya zarokan kêm bûye an pêdivî bi xurtkirina danûstandina navkomî bûye, amûrên mîna dramayê gelek caran bi kar anîne. Û ya dawî gava sazgehên hunerê (bo mînak; klûba şanoyê an dibistana muzîkê) bi zarokan re xebitîne li gel ku hunêr wekî amûrekê bi kar anîne, hewl dane şiyanên hunerî yên zarokan jî geş bikin û ev wekî armancekê dane ber xwe.

> "Bi veçerxînê tiştik û miştik derketin holê. Zarok hem fêrî veguherîna tiştan bûn; yanî em bo çi van dihilînin, plastîk çi ye vediguhere çi, gava em qaxezên rojnameyan bixin nav avê, bistrên dibin çi... Hem fêrî vê bûn hem tiştikên wan çêbûn. Bo mînak, bûn xwedî çente û hwd. Yanî afirîneriyek jî li wir ava dibû. Piştî vê me peşangeh saz kir. Pêşkeşiyek çêbû."

> "Me şano xweş bi kar anî. Û muzîkeke me ya zarokan jî hebû. Çalakiyên me hebûn ku saleke dom kirin. Me kargehên dramayê saz kirin. Berî wê, piştî wê jî me muzîk saz kir. Me kargehên peykersaziyê ava kirin."

TABLO 3: Amûrên Hunerê yên ku di Çalakiyan de Hatine Bikaranîn

| | |
|---|---|
| Hunerên Dîtbarî | Vîdeo, fotoxraf, anîmasyon, wênexêzî, peykersazî, peykersaziya bi kereseyên avêtî |
| Hunerên Performansê | Dansên nûjen, şano, dramaya afirîner, kukla, çîrokbêjî, xwendin û dramatîzekirina çîrokan bi kurdî |
| Hunerên Destkariyê | Sêwirandina xişran, çêkirina tiştan ji kulavan, çêkirina pêlîstokan, veçerxîn, boyaxkirina textikan, boyaxkirina keviran, çêkirina boyaxê, lîstik, maske, orîgamî |
| Sînema, Muzîk, Edebiyat | Sînema, temaşekirina fîlman, lidarxistin û beşdarbûna mîhrîcanan, konser, enstruman, komên muzikê, rîtma xwezayî, xebatên koroyê, koroya zarokan a pirzimanî, xebatên edebiyatê |

## III-2.1.4. Beşdarbûna Dêûbavan

Derbarê vê mijarê bi beşdaran re hevdîtin bûn. Bi van hevdîtinan me xwest fêm bikin bê dêûbav bi awayekî çalak tevlî xebatan bûne an na, an jî bo wan çalakiyên/xebatên cuda hatine lidarxistin an na. Naveroka van çalakiyan jî ew bû ku me dixwest fêm bikin. Gava em paşxaneyê û beşa xwegihandina dêûbavan dinirxînin tê fêmkirin ku di şert û mercên heyî de tevlîkirina dêûbavan bo xebatê çiqasî zehmet e.

> "Di xebata me de tevlîkirina malbatan bo xebatê gelekî kêm bû. Tenê ew bû ku em derbarê zarokan hinek agahiyan bi dest bixin... Lêbelê di qonaxên xebatê yên pêş de hin jinan jî got ku pêdiviya wan jî bi xebateke wisa heye. Hevalên me yên derûnnas bi wan kesan re hevdîtinên takekesî kirin."

Di hevdîtinan de hemû beşdaran diyar kir ku beşdarbûna dêûbavan gelekî girîng e lê wan nikariye vê bikin. Hat dîtin ku derbarê xebatên çalak yên bo zarokan, dêûbav hatine agahdarkirin û kêm sazgehan xebat bi dêûbavan re kiriye. Hin beşdaran diyar kiriye ku di qonaxa agahdarkirinê an jî xebatan de serdana malbatan kiriye, hinekan ji wan jî tenê bi telefonê malbat agahdar kirine. Hin beşdarên din jî gotiye ku nemaze gava zarok bo çalakiyan birine an gava çalakî qediyane bi malbatan re dane û standine.

> “Di qonaxa xebatê de bi pirsên mîna ‘xebat çawa ye, çi bandorê li zarokan dike, di vî warî de pêdiviyên we çi ne?’ me birêkûpêk serdana malbatan kir.”

> “Hevalên me, pisporên xizmeta civakî, carina mehê carekê carina jî ji 20 rojan carekê carina jî li gor pêdiviyê hefteyê carekê serdana malbatan kir.”

Hin nûnerên sazgahan gotiye ku di qonaxa xebatê de bi malbatan re dane û standinê û carina hatine cem hev çalakî li dar xistine. Berevajî sazgehên din kêm sazgehan beşdarbûna dêûbavan wekî parçeyekî xebatê nirxandiye. Sazgehên ku di qonaxa xebatê de aliyê piştevanî yê xebata bi dêûbavan re dîtiye û şert û mercên wan guncav in beşdariya dêûbavan wekî modûlekê bi kar aniye.

> “Beşdarbûna malbatan, xebata me ya herî bingehîn bû. Lewra bêyî wan gelekî zehmet e ku tiştek biguhere û veguhêze.”

> “Beşdarbûna malbatan ne tenê ji aliyê perwerdehiyê ve... Jixwe em hewl didin malbatan tevlî hemû karên komeleyê bikin. Em bo çalakiyên komeleyê carina bo tamîrê, paqijkirinê teqez gazî malbatan dikin.”

> “Me di xebata xwe yî duyem de beşdariya malbatan mecbûrî kiribû. Diviya ji dêûbavan yek û zarok bi hev re tevlî xebatê bibûna. Loma me li qada xebatê ji nû ve serdana malbatan kir. Jixwe bi piranî malbatan jî dixwest zarokên wan tevlî xebatê bibin lê bo hatina xwe bi fikar bûn...”

Nemaze beşdarên serbixwe yên mamoste, diyar kiriye ku derbarê xebatên li dibistanên xwe bi awayekî hêsan dêûbav agahdar kirine.

> “Di danişînên xebatê de gava tiştekî derasayî dibû min dêûbav agahdar dikirin. Ji bilî vê dêûbavan bixwe jî gelek caran serî li servîsa şêwirmendiyê dida. Dixwestin guherînên zarokên xwe, çavdêriyên xwe yên erênî ragihînin. Fersenda me çêdibû ku di vê mijarê de em suhbetan bikin. Agahdarkirina derbarê qonaxê bi vî awayî pêk dihat...”

Tê dîtin ku gelekî kêm sazgehan bo dêûbavan çalakiyên xweser li dar xistine. Herçiqasî hin sazgehan diyar kiriye ku bi mebesta fêmkirina serborî û pêdiviyên wan hatine cem hev jî ev hevdîtin bi hevagahdarkirinê sînordar mane. Beşdarên ku di qonaxa agahdarkirinê û lihevcivînê de rastî pirsgirêkan hatine jî behsa wê kirine ku vê bandoreke neyînî li xabatan kiriye û ev bo xebatên têkildarî zarokan kêmasiyeke bingehîn e.

## III-2.2. Pirsgirêkên Sepanê, Rîsk û Sînordarî

Di vê beşê de dê derbarê sazgeh û kesên rêvebirên xebatê û pirsgirêk û astengiyên li ber wan agahî bê dayîn. Weke ku tê zanîn bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal yek ji wan amûrên midaxeleyê ne ku piştî trawmayên takekesî an civakî herî zêde tên bikaranîn. Ji ber qada midaxeleyê jî pêkan e di qonaxa midaxaleyê de pirsgirêk derkevin pêşberî mirov. Di bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal yên mijara vê lêkolînê de bi wê sedemê ku di qonaxa şer û pevçûnên giran an sivik de hatine lidarxistin gelek pirsgirêk derketine pêşberî xebatkaran. Agahiyên ji hevdîtinên bihûrgulî, nişan didin ku pirsgirêk piralî ne. Li jêr ev pirsgirêk bi sernivîsên diyar tên ravekirin.

### III-2.2.1. Butçeya Kêm

Hema bêje hemû beşdaran aniyê zimên ku kêmayiya butçeya xebatê hin pirsgirêk û kêmasî bi xwe re anîne. Sedemeke vê ew e ku mesrefên ne di hesêb de derketine û pêşbînî bi wan nehatiye kirin. Piraniya beşdaran ragihandiye ku butçeya pêwist bo xwegihandina mirovan û materyalên din ên xebatê û xebata berfirehtir gelekî girîng e. Rewşa ku sazgeh û kesan bi butçeyeke kêm xebat bi rê ve biriye, encameke şênber derxistiye holê ku beşdaran nikariye gelek zarokan tevlî xebatê bikin. Beşdaran diyar kiriye ku bo serederîkirina vê pirsgirêkê carina ji bêrîka xwe mesref kirine lê ev ne rewşeke wisa ye ku domdar be. Di piraniya xebatan de bikaranîna hunerê wekî amûrekê, pêdiviya keresteyên bo çalakiyên hunerî bi xwe re aniye û beşdaran ragihandiye ku di bidestxistina van kereseyan de zehmetî dîtine.

> "Me mesrefa projeyekê ji bêrîka xwe kir. Me çar hevalan bi hev re ji bêrika xwe mesref kir"

> "Tu hunerê wekî amurekê nişan didî lê rastî jî zehmet e tu fonekê bo vê xebatê bibînî û fînanse bikî. Pêdivî bi hin kereseyan heye bo ku ev xebat baştir bên kirin. Bo kargeha wênekêşiyê bi wêneyan, bo kargeha dramayê bi mirêkan, bo wênexêziyê bi boyax û qeleman pêdivî heye."

Di xebatan de kêmasiyeke din î mezin a girêdayî kêmayiya butçeyê ew e ku alîkariya pisporan sînordar e. Beşdaran ragihandiye ku ji ber butçeya kêm nikarîne pisporan ji derveyî bajêr bînin û gelek xebat bi komên dilxwaz bi rê ve birine. Di xebatên civaka sivîl de çalakiyên bi dilxwazî gelekî hêja ne, ji aliyê gelek kesan ve tên pejirandin lê ew a ku hemû xebat bi kesên dilxwaz bê kirin dûrî rastiyê ye û bo domdariya xebatê rîsk e. Meseleya ku bo rêvebirên xebatê di qada hunerî û derûnî de perwerdehiyên berfireh nikariye bên dayîn û kêmasiya pisporiya vê mijarê jî ne rasterast be jî dikare bi kêmayiya çavkaniyên aborî ve bê girêdan.

"Helbet alîkariya aborî girîng e. Lêwra divê mezin jî hevalên xebatkar jî debara xwe bikin û bo vê jî pêdiviya wan bi aboriyê heye. Ev rewşa derûnî gelekî zehmet e. Gelek hevalên me ji kar hatin avêtin, gelekan jê ev qebûl nekir û dev ji kar berdan"

"Hevalan bi dilxwazî ev xebat bi rê ve bir. Lêbelê heta kengî dê bikaribin vê bikin? Ew rîsk heye ku ew kes ji ber zehmetiyên aborî dev ji kar berdin. Ji ber ku butçeya me nîne em nikarin heqê wan jî bidin."

Bi kurtasî beşdaran bi giştî ragihandiye ku wan dikariye gelek zarokan tevlî xebatan bikin, xebatên demdirêj bikin, bo dilxwaz û sepaneran bêhtir xebatên xurtkirinê bikin, mekanên ji aliyê fizîkî ve guncav di xebatan de bi kar bînin û dê ev li gel ku xebatê geş bikin asta sûdwergirtina zarokan a ji xebatê jî bilind bikin. Lêbelê ji ber butçeya kêm xebat ji wî alî ve lawaz bûne.

## III-2.2.2. Kêmasiya Pisporiyê di Mijara Trawmayê de

Qadeke din a rîsk û pirsgirêkan a ku beşdaran nişan daye, bêewlehiya zarokan a girêdayî pevçûnê, bêpergaliyên psîkososyal, trawma û pirsgirêkên têkildar in. Beşdaran diyar kiriye ku rewşa derûnî ya zarokan pêdivî bi alîkariya pisporan aniye lê ji ber ku di sazgehên wan de kesên pispor nînin ev bo xebatê bûye kêmasiyek. Sazgehên di ekîba wan de xebatkarên tendirustiya derûnî hene jî ragihandiye ku hîn rehettir serî bi van zehmetiyên wisa derketine û wan dikariye hem bo zarokan mekanizmaya piştevaniya takekesî saz bikin hem di warê xebata bo zarokên duçarî trawmayê de alîkariya sepaneran bikin.

"Em rastî hin rewşên taybet dihatin, têkildarî jiyana zarokan a derûnî. Ji ber şideta li malê ye an girêdayî erdnîgariyê ye em nizanin lê ew dem hebûn ku me pirsyariya wê dikir lê me nikarîbû zarokan fêm bikin."

Wekî zehmetiyekê hatiye pênasekirin ku bi qasî zarokan, rêvebirên xebatê jî zehmetiya şert û mercan dîtiye. Hin beşdaran gotiye ku xebatên bi zarokan re bo serederîkirina trawmayên wan jî bûne alîkar, hinekan ji wan jî gotiye ev rewş xebatê zehmet dike. Pisporên ku bo zarokan xebatan li dar dixin û dilxwaz jî dûçarî serboriyên trawmatîk dibin. Li gel vê, ew bi wan zarokan re dixebitin ku hewl didin serî bi trawmayên xwe derkevin û ne rasterast be jî ev jî bandorê li wan pispor û dilxwazan dike. Di xebatên bi vî rengî de kêmasiyek jî ew e ku bo serederîkirina vê derfet nîne pispor alîkariyê bikin.

"Rewşê gelek bandor li me jî kir, ji aliyê derûnî ve. Carina bi me gelekî zehmet hat. Di ser de li hember zarokan zehmetiyên zordarî û ewlehiyê jî hebûn."

### III-2.2.3. Cihên bo Xebatan Bêewle û Ne Guncav

Bo xebatên bi zarokan re pêkhateya herî girîng hebûna cihên/jîngehên bi dilê zarokan e. Divê jîngehên/cihên zarokan xwedî wan taybetmendiyan bin ku zarok zererê nebînin, hestên xwe rehet derbirînin, avahîsaziya wan li gor geşedana wan be û xwe tê de ewle hîs bikin. Lêbelê bo xebatên mijara vê lêkolîne li gel ku bikaranîna cihên guncav ne pêkan bû, şert û mercên pevçûnê bûne sedem ku kolan û qadên vekirî jî bo zarokan bibin cihên bêewle. Di hevdîtinan de, beşdaran diyar kiriye ku nebûna cihên xweşsazkirî ku zarok lê bicivin û bêewlehiya cihên derve bo wan astengeke mezin bûye. Di dema xebatan de herçiqasî pevçûn qediyabûn jî li kolanan wesayîtên bizirx û avêtiyên pevçûnê, nemaze li cihên vekirî bo xebatê zehmetiyên giran derdixistin pêşberî me.

> “Û cihekî me jî tune bû. Qadeke ku em zarokan lê kom bikin û tê de ewle bin tune bû. Bo mînak, em li parkan bûn an li nav baxçeyên malên hevalên xwe an jî baxçeyên dibistanan dihatin bikaranîn.

> “Di sazkirina cih de pirsgirêkên giran derketin pêşberî me. Lewra li aliyekî dinya xera dibû, li aliyekî me dixwest li cihê xwe qadeke ewle saz bikin. Diviya ew qad jî ji qada şer dûr bûya. Peydakirina qadeke ewle rastî jî zehmet bû, hejmara sazgehên ku vê bînin cih pir kêm bû. Dê şert û mercên wê demê bên bîra we. Qonaxek bû ku me zehmetiyên giran dîtin, me kedeke mezin pê da”

> “Zehmetiyên hebûna me ya li vir hebûn ji ber ku li kolanan zarok ne di ewlehiyê de bûn. Me di 2-3 hefteyan de carekê dibihîst ku panzeran li zarokekî daye”

Hatiye ragihandin ku li gel zarokan sazgeh û kesên rêvebir jî bi pirsgirêkên girêdayî ewlehiyê re rû bi rû mane. Di nav wan agahiyan de ew jî hene ku berî hin xebatan, nûnerên sazgehan bi zordariyeke giran re rû bi rû mane, hin xebat ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine çavdêrîkirin, di nav xebatê de nasnameya dilxwazan hatiye xwestin û hêzên ewlehiyê gelek caran derbarê lidarxistina xebatê pirs kirine.

> “Yanî tiştên mîna pirsyariya nasnameyên dilxwazan, ‘çi karê we li vir heye’, ‘hûn bo çi xebatê dikin?’ hatin serê me. Vê jî tu bikî nekî bandor li xebatên dilxwazan kir, hem talûkeyek hîs kirin. Heqê wan hebû vê talûkeyê hîs bikin.”

### III-2.2.4. Rewşa Siyasî û Nirxên Newekhevîxwaz ên Civakê

Dema lêkolînê ku li bajarên qada xebatê piştî pevçûna giran jîngeheke pevçûna sivik li dar bû, rewşa awarte û tayînkirina qeyûman bo rêvebiriyên herêmî bûye sedem ku rewşeke siyasî ya bipevçûn bidome. Beşdaran gelek caran aniye zimên ku vê rewşê

bandor li xebatên wan kiriye. Pirsgirêk/zehmetî/rîskên girêdayî vê rewşa siyasî ya bipevçûn bi awayê; rêlibergirtina xwegihandina çavkaniyên pêwîst, sînordarkirina axaftina zimanê zikmakî, astengkirina beşdarbûna dilxwazan bo xebatê, tawanbariya xebat û rêvebirên xebatê û rengvedana van li destûrên sazgehên fermî hatiye ragihandin. Herwiha tayînkirina qeyûman bo rêveberiyên herêmî ku sedemeke sereke ya rewşa siyasî ya bipevçûn e, rê li ber girtiye ku alîkariyên lojîstîk yên bo xebatan pêwîst (cih, veguhastin û hwd) ji holê rabin.

> “Rewşa siyasî sînordariya alîkariyê jî bi xwe re tîne. Di şert û mercên asayî de me dikarîbû bo zarokên piçûk butçeyekê saz bikin. Lê tu kesî piştevaniya xebatên me nekir.”

> “Tu dikarî xebatekê li her cihî bikî, lîstikê bilîzî, mîhrîcanekê li dar bixî lêbelê gava bi zimanê te yê zikmakî be mixabin girêdayî rewşa siyasî helwesteke polîtîk rû dide.

> “Berê em bi rehetî diçûn zanîngehê, ji mamosteyan bo dilxwaz bi me re bixebitin alîkarî dixwest û bi rehetî li polan bangewaziya wê dikir û beşdarbûna wan bo perwerdehiyê pêk dihat. Lêbele êdî mamosteyên zanîngehê jî tirsa xwe tînin zimên, rêyên din nîşanî me didin, pêşniyazan dikin.”

> “Rîskeke me jî ew bû ku ji ber tawanbarkirine xebat nîvco bimînin.”

> “Em di warê peydakirina dilxwazan de gelek zehmetiyan dibînin. Carina derdora me ya nêz jî me hîşyar dike. Bo mînak hin dibêjin, ji bo xwedê tu tevlî vê xebatê nebe, jixwe gelekî lêpirsîn li te bûye.”

> “Ku em bi demen berê yên rêvebiriyên herêmî re bidin ber hev, jixwe me gelek tişt winda kirin. Gelek qad ji destê me çûn. Hem me qada gelemperî ji dest da hem salon hem navendên çandê. Yanî edî ew derfetên me nînin.”

> “Piştî şaredariyan edî kes jî hew alîkariyê dikin. Yanî xwediyê şîrketekê ditirse ku bo komeleyekê sponsoriyê bike. Gava xebateke hevpar tê kirin ditirse ku alîkariya aborî bike.”

Hin beşdaran jî ragihandiye ku cihguhertina bi darê zorê bandor li tevlîbûna zarokan kiriye; di xwegihandina zarokan de, derbarê cihê wan û loma jî berdewamiya wan a bo xebatan zehmetî dîtine.

"A herî zehmet çi bû hûn dizanin? Zarok, ji ber ku mala wî xera kirine terka bajêr dike, mala xwe bar dike. Em wî nabînin, winda dibe û diçe"

"Gelek mirov mecbûr mabûn ku koç bikin û derbarê xwegihandina zarokan, xwegihandina birêkûpêk me gelek zehmetî dîtin."

Beşdaran diyar kiriye ku ji aliyê pirsgirêk/zehmetî/rîskên xebatê ve bi her çar qadên piersgirêkê re carcaran taybetmendiyên ne wekhevîxwaz yên mîna hişsaziya zayendi ya civakî ya nirxên olî û çandî, beşdarbûna bi hev re ya zarokan ya bo çalakiyan zehmet kiriye û malbat jî di warê beşdarbûna zarokên xwe de dudilî mane.

"Me dît ku dibêjin me 'çi karê zarokan li şanoyê heye?'"

"Koma min a xebatê 10-12 salî bû. Qîz û law nedihatin cem hevdû. Min çiqasî dixwest wan nêzî hev bikim, dûrî hev disekinîn."

TABLO 4: Tabloya Kurteya Qonaxa Sepanê

| | |
|---|---|
| IIII-2.1. Plansaziyên Berî Sepanê | Destûr, erêkirin û agahdarkirin<br>• Erêkirina dêûbavan<br>• Qonaxa destûrê ya sazgehên fermî |
| | Xurtkirina sepaneran |
| | Çalakiyên sereke û amûrên hunerê yên hatine bikaranîn |
| | Beşdarbûna dêûbavan |
| III-2.2. Pirsgirêkên Sepanê, Rîsk û Sînordarî | Butçeya kêm |
| | Kêmasiya pisporiyê di mijara trawmayê de |
| | Cihên bo xebatan bêewle û ne guncav |
| | Rewşa siyasî û nirxên newekhevîxwaz ên civakê |

# III-3.
## BANDORA HUNERÊ

Serboriyên trawmatîk yên girêdayî qonaxên pêvçûnê rasterast bandorê li jiyana rojane, standart, awayê reftar û ramana rojane ya kesên dûçarî trawmayê dike û di van qonaxan de dibe sedema guherînên dramatîk. Ji ber vê, zehmet e ku mirov bi wan kesan re bixebite ku serboriyên wan yên girêdayî pevçûnê hene û li gel vê pêdivî bi bernameyên midaxeleya psîkososyal ya taybet heye. Ji ber ku gelek faktor bandor li trawmayê dikin, herwiha pêdivî bi wê heye ku bername jî li gor kes, temen an zayendê cuda bin. Ne rast e ku mirov zarok û mezinan ji aliyê asta bandorkariyê ve bide ber hev lê dê ne xelet be ku mirov bibêjê, di bernameyên piştevaniyê yên bo zarokan de curbicuriya amûr û teknîkên alîkar girîngtir e. Lewra zarok di qonaxên taybet yên geşedana xwe de ne û her qonaxa geşedanê xwedî taybetmendî û zehmetiyên cuda ye. Bo mînak, bikaranîna lîstikê bo derbirîna hestên zarokan -nemaze yên 3-6 salî- gelekî bandorker e û bandorkeriya wê jî bi taybetmendiyên qonaxa geşedanê re têkildar e. Zarokên di vê komê de, dinyayê mîna dikeke lîstikê dibînin û di qonaxa perwerdehiyê de, di danûstandinê de û bo derbirîna hestan, wekî amûreke xwezayî bi kar tînin. Ji ber vê, di bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal bo zarokên di van salan de, bikaranîna hunerê û cureyên cuda yên hunerê, faktoreke ku bandora xebatê zêde dike.

Bandoreke trawmatîk a pevçûnan li zarokan ew e ku baweriya wan dişikîne. Di vê çarçoveyê de di bernameyên piştevaniya psîkososyal de jinûvesazkirina baweriyê gelekî girîng e. Sazkirina baweriyê li gel şiklê danûstandina bi zarokan re bi taybetmendiyên derdorê rasterast bi wan amûran ve girêdayiye bê çiqasî li gorî zarokan in. Cureyên hunerê yên cuda dikarin bo zarokên temenê wan ne yek û pêdiviyên wan ji hev cihê amûrên curbicur pêşkêş bike û qadên derbirînê ava bike. Li gor vê, bo zarokên dûçarî serboriyên trawmatîk bikaranîna hunerê wekî amûrekê û curbicuriya wê, faktorek e ku hêza xebatê xurttir dike.

Heke naveroka bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal tenê terapi be, ev wekî kemasiyekê tê nirxandin. Lê hatiye ragihandin ku ev bername ne yekalî ne û ne pêkan e mirov behsa kêmasiyeke wisa bike. Piralîbûna bernameyên piştevaniya psîkososyal ji sûdwergirtina ji hunerê tê. Gotinên beşdarekî yên li jêr vê xweş ravê dikin:

> "Piştevaniya psîkososyal bixwe hinekî hişmendî û hayjêbûnê pêwist dike. Ji ber vê, mixabin tenê xitabî komeke diyar dike. Ji ber vê divê amûrên wê biguherin, veguhêzin. Di vê çarçoveyê de huner rêbazek e da ku piştevaniya psîkososyal bo her kesî bê kirin."

Dibe ku zimanê zikmakî yê zarokan cuda be. Bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal bo wan koman jî tên sazkirin. Bo van koman jî huner ew amûr e ku danûstandina

komê xurt dike û hemû zarokan li xwe digire. Gelek cureyên hunerê, ew amûrên herî girîng in ku zarok bi wan zimanekî hevpar saz dikin.Yek ji wan xalên ku ev lêkolîn li ser radiweste ew e ku di bernameyên piştevaniya psîkososyal yên bo zarokan de bandorkeriya bikaranîna hunerê bê pêşberkirin. Beşdaran ragihandiye ku bikaranîna hunerê wekî amûrekê çiqasî mirovan rehet dike û çawa bandorê li zarokan dike. Agahdariyên beşdaran yên derbarê bikaranîna hunerê li jêr hatine ravekirin.

## III-3.1. Hêza Hunerê ya Sazker

Pakbûna ji trawmayê ew qonax e ku demeke dirêj dixwaze, pirhêl e û divê qadên pisporiyê yên cuda pê dakevin. Helbet rêbazên hunerî îdîa nakin ku dê bi serê xwe heq ji trawmayê derkevin lêbelê ev rastiyek e ku bo başbûnê hevkariyeke girîng dikin û deriyan li mirov vedikin ku amûrên didin nikarin wisa bibin alîkar. Bi vê perspektîfê, beşdaran ragihandiye ku hêzeke hunerê ya sazker heye û wan çavdêriya wê kiriye ku bo serederîkirina trawmayên zarokan yên girêdayî dorhêlên bipevçûn û guherîna ber bi başiyê ve huner xwedî roleke girîng e.

> "Me di wêneyên zarokan de û di kargehên din de dît ku hêrs kêm dibe"

> "Xwişka min mamosteya perwerdehiya taybet e. Di sazgeha wê (Wezareta Perwerdehiyê ya Neteweyî) de zarokek hebû ku 6 mehan pê re eleqedar bûbû. Zarokê nikarîbû biaxive. Tu asteng li ber nebûn. Tenê nikarîbû biaxive. Di piştevaniya taybet de perwerdehiya axaftinê dikir. Ji min xwest ku ez kuklayeke rengîn çêbikim. 'Xwendekareke min heye, dixwazim di perwerdehiya axaftinê de kuklayê bi kar bînim.' Min jî çêkir. Piştî demekê xwişka min, girî di xwêsiyê de, hindik maye bigirî hat û got, zarok axiviye. Di axaftina xwe ya pêşî de navê birayê xwe gotiye, kukla wek birayê xwe dîtiye û navê birayê xwe bi lêv kiriye. Tenê wê peyvê ewqasî bandor lê kiribû ku... 6 mehan bi zarokê ve mabû lê tiştek bi dest nexistibû lê bandora kuklayê dît."

## III-3.2. Bandora Hunerê li Hêza Derbirînê

Hema bêje hemû beşdaran diyar kiriye ku zarok ji ber şer û pevçûnê bêdeng bûne lê bi rêya hunerê şiyana derbirîna hest û ramanên wan xurt bûye.

> "Ji ber trawmayê her tişt avêtiye dilê xwe lê wêneyan xêz dike, bi wêneyan, bi xêzkirinan ya dilê xwe dibêje. Me çend mînakên wisa dîtin."

> "Ya rastî dipirsim lê bersivê nade. Lê gava dibêjim wêneyan xêz bike, gelekî rehet xêz dike. Difikire ku bi wêneyan a dilê xwe dide der"

"Ya dawî, armanceke hunerê jî ew e ku gava peyv têra me nekin em bi dramatîzasyon, wêne, muzîk, dans, zimanê bedenê û ritimê hestên xwe derbirînin."

"Gava di xebatê de tu vê dibînî bêhtir tetmînkar e. Yanî di qadê de, di çalakiyên me de, tiştên em bi rêya sîrkê dibêjin, lîstikên me, şano bi rêya kuklayan... Çavdêrîkirina wê ku zarok bi kuklayan hestên xwe derdibirînin. A rastî gelekî bikaranîner e, xizmetê bo başbûna zarokan dike."

## III-3.3. Danûstandina bi Zarokan re

Beşdaran behsa rola hunerê ya di danûstandina zarokan de kiriye, wan ragihandiye ku bi rêya xebatên hunerê di navbera dinyaya zarokan û wan de têkiliyek pêk hatiye.

"Di salên 2015-2016an de nêzî du salan ez bi wan koçberan re xebitîm ku ji Kobanî û Şengalê hatine. Ji nav şer hatibûn. Gelekan ji wan malbata xwe winda kiribû. Vê gelekî bandor li min kiribû. Gava em çûn plana me tiştekî din bû. Gava em gihan wir, yanî kampan, me tiştekî din dît. Malbat vekişiyabûn odeyên xwe, zarok gelekî ecêb bûn. Rewş bi tirs bû. Hêdî hêdî me bi zarokan re dest bi xebatên hunerê kir û me hêza van xebatan a sazker ferq kir. Piştî vê malbat jî ji konên xwe derketin, malbatên ku nikarîbûn bên cem me jî hatin nav me û tevlî xebatan bûn. Qonaxeke gelekî cuda bû."

"Gava tu bi hunêrê nêzî zarokan dibî tu dikarî xeyalên wan û trawmayên wan fêm bikî û bi vê rehetiyê zarok jî derdê xwe ji te re dibêjin. Bi dramayê, bi stranan tu dikarî xwe bigihînî wan."

## III-3.4. Bandora Hunerê li Sazkirina Zimanekî Hevpar

Beşdarên lêkolînê herwiha diyar kiriye ku "zimanê hunerê tune ye" û zimanê hunerê bo her kesî ye. Beşdarekî ku bo zarokên koçber xebat kiriye û zimanê wê komê nizane gotiye ev ancax bi "hunera mîm"ê pêkan bûye ku peyv nayên bikaranîn û zarok bi vî awayî tevlî xebatê kirine û zarokan bi mezinan re ku bi zimanê wan nizanin, zimanekî hevpar saz kiriye.

47 Bi awayê EBAyê tê zanîn. Ji aliyê Wezareta Perwerdehiya Neteweyî ve hatiye avakirin ku naverokên elektronîk yên perwerdeyî yên civakî dabîn dike û di qonaxa şewba cîhanî Covîd-19ê de bo perwerdehiya jidûrve hatiye bikaranîn.

> "Hunera mîmê bo me qadeke balkeş bû. Lewra me ew bo zarokên koçber bi kar anî. Zarok hebûn ku ji Kurdistanê, ji Suriyeyê hatibûn û pirsgirêka zimên rû da. Ji ber ku di mîmê de zimanê bêjeyî nîne, ji ber ku zimanê bedenê aktif dike me girîngî bi hunera mîmê da ku zarokên em zimanê wan nizanin tevlî xebatê bikin."

## III-3.5. Bandora Hunerê li Derbirîna Hestan

Beşdaran ragihandiye ku zarokan derfeta derbirîna rewşa xwe ya derûnî ya girêdayî qonaxa pevçûnê ancax bi rêya hunerê bi dest xistiye. Beşdaran gotiye, di van xebatan de ku zarok hestên xwe derdibirînin û ya dilê xwe didin der, girîng e ji qada tendirustiya derûnî jî kesek bi rêvebiran re bixebite û heke pêwîst be midaxaleyî rewşê bike.

> "A rastî gava em dinirxînin; em li wêneyên, li helbestên zarokan dinêrin. Bo em rewşa zarokan a derûnî fêm bikin em li hilberînên wan, li stranên wan dinêrin. A rastî em bi vî awayî fêm dikin ku zarok xwe çawa hîs dikin."

> "Zarokan çîrçîrokên xwe afirandin û bi van çîrçîrokên xwe hewldan zehmetiyên li ber jiyanê, pirsgirêk û derd û kulên xwe bînin zimên."

> "Me bi wan zarokan re xebat dikir ku malbatên wan ji nav şer û pevçûnê hatibûn. Di xebatê de zarokê wêneyê jinekê xêz kir lê çavên wê jê birin, xêz kir dîsa jê bir, dîsa xêz kir û dîsa jê bir. Dawiyê qelem danî û dest bi girî kir. Çûm cem min pirsî; 'bo çi digirî', got; 'çavên wê çênabin nikarim'. 'Gelekî xweşik çêbûye, bo çi tu dibêjî nizanim xêz bikim?' Zarokê; 'Çavên meta min xweşiktir bûn' got û bi dest girî kir. Tu nabêjî meta wê hatiye kuştin. Weneyê wê xêz dike lê nikarê li gor dilê xwe xêz bike. Di vir de derûnnasan midaxele kir. Ji min nehat ez tiştekî bo vê bikim. Hevalê me yên derûnnas çi kir, ez nizanim, lê piştî demeke kurt 'Binêr mamoste (bi kurmancî) çavên meta min xweşik çêbûne' û bi kên wêne nîşanî min da. Lewra min fêm kir ku bo rewşên wisa derûnnas gelekî girîng in. Di perwerdehiyan de jî ev ji me re gotibûn. Heqê wan hebû vê bêjin..."

> "Huner a heyî bi zelalî nişan dide. Gava tu baş binirxînî, dê xweş rê li ber te bixe bê tu dixwazî çi bikî. Di vê çarçoveyê de, bo xebatên derbarê trawmayê huner a herî girîng e. Lewra huner piştgiriyê jî nişan dide. Huner ji me re dibêje ku divê em xurt bin. Huner tîne bîra me. Xweş tîne bîra me..."

## III-3.6. Sazkeriya Hunerê bo Mezinan

Beşdaran diyar kiriye ku hunerê li gel zarokan bandor li wan jî kiriye. Hin beşdaran diyar kiriye ku bo serederîkirina bandorên qonaxê -serederîkirina trawmayên xwe-xebat kirine û wan ev xebat nişana wê dîtine ku li hember rewşa siyasî ya zehmet hê jî li ber xwe didin.

> "Par ez jî tevlî xebatên dramayê bûm. Me da lotan, me bazda em ketin, em li ser serê hev siwar bûn. Gelek tişt. Em bûbûn zarok, ez gelekî bextewar bûm, min ferq nekir wext çawa diçe."

> "Teqez huner gelekî bikêrhatî ye. Ji bo xebata me jî û bo me jî. Gava zarok wêneyekî xêz dikin em jî bi wan re dest bi xêzkirina wêneyan dikin. Piştre me ferq dikir ku em jî di bin bandora pevçûnê de mane. Ne tenê zarok em jî ew takekes bûn ku di wê qonaxê re derbas dibûn û şahidiya qonaxê dikir."

> "Belkî bo wan ev qonax cuda bû, girantir bû lê pêdiviya me jî pê hebû. Em bi wan re tevlî vê qonaxê bûn. Yanî bi rastî jî huner bo xebatên me gelekî sûdwer bû. Em çiqasî bi temamî negihabin armanca xwe jî huner gelekî bi kêrî me hat."

## III-3.7. Xwenasîna bi Rêbazên Nû

Beşdaran bandoreke din a hunerê nişan daye. Zarokan serboriyên nû jiyane, berê xwe daye rêyên çareseriyê ku tecribe nekirine û di vê qonaxê de aliyên xwe yên xurt û lawaz dîtine û wan bi vî awayî xwe baştir nas kiriye.

Herwiha di vê qonaxê de hişsaziya xwebûnê ya zarokan guheriye û zarok hatine wê merhaleyê ku bi xwe re li hev bikin, rewşê û sedem û encamên wê binirxînin.

> "...Li vir gok hene, ev zarok an ez bêjim se, pisîk... Li vir asê mane, hûn dê wan çawa rizgar bikin? Em ta û sîtilan didin wan, xeyalan bi gokan dikin. Ji ber ku ew li vir bi hev re ne û li gel hev li çareseriyê digerin, di şiyanên çareserkirina zehmetiyan de serwext dibin."

> "Zarokan ferq kir ku ew ne 'yên din' in. Bo mînak, zarokan ferq kir ku di rastiyê de ji hev ne cuda ne; tenê ji ber derfetên aborî, ji bilî vê ji ber koçberiyê, ji ber şer û rewşa têkildarî şer, em nikarin xwe bigihînin wan; ferq kirin ku ew ne yên din in."

### III-3.8. Huner bi Zimanê Zikmakî

Di xebatên hunerî de giranî li ser zimanê zikmakî ye. Beşdaran bi taybetî girîngiya zimanê zikmakî ya xebatan aniye zimên. Xebatên hunerê yên bi zimanê zikmakî, nîşanî wan zarokan daye ku dikarin di xebatan de zimanê xwe yê zikmakî bi kar bînin, û dê hilberîn, danûstandin, piştgirî û başbûn ancax bi zimanê zikmakî pêkan be.

> "Hindik maye zarok kurdî ji bîr bikin. Belkî jî ev cara peşî bû ku zarokan bi kurdî stran digotin... Belkî jî cara pêşî, me bi zarokan re li derveyî malê, bi zimanê zikmakî xebateke bo wan balkêş kir. Yanî zarokan fêm kir ku ev ziman tenê ne yê dê û bavên wan e, dîtin ku dikarin bi zimanê xwe jî dikarin stranan bêjin, şanoyê bikin."

> "Ez dibêm gava zarok cara pêşî hatin vê derê, difikirîn ku kurdî zimanekî qedexe ye. Lê ev guherî."

> "Kurdî kir ku zarok qada giştî bi kar bînin, di pratîkê de derfeta me ya herî mezin ew bû ku em zimanê kurdî bi kar tînin. Ev bi serê xwe baweriyekê dide zarokan, zarok li xebatê germ dibin. Gava tu rastî zarokekî dûçarî siyaseta vê derê tê û ew wî zimanî ji te dibihîze, danûstandin rasterast geş dibe. Di vê çarçoveyê de ziman gelekî rê li ber mirov vedike."

# III-4.
## PÊDIVÎ Û PÊŞNIYAZÊN DERBARÊ PÊŞEROJÊ

Di lêkolînê de me xwestiye ku xwe bigihînin beşdaran bê di qonaxa li pêş me de, bo berdewamiya xebatê pêdiviyê bi çi dibînin. Gava em agahiyên bidestxistî dinirxînin, tê dîtin ku pirsgirêkên qonaxê pêdiviyan jî bi xwe re tînin. Di vê beşê de bi du sernivîsan pêdiviyên beşdaran, pêşniyazên wan yên bo pêdiviyan û "perwerdehî"yên têkildarî wê ku di bernameyên piştevaniyê de huner bê bikaranîn û giringiya vê bo xebatan, cih digirin.

## III-4.1. Pêdiviyên bo Berdewamiya Xebatan

### Alîkariya butçeyê/fonan

Gava agahiyên beşdaran tên nirxandin tê dîtin ku butçe wekî pêdiviyeke bingehîn hatiye pênasekirin. Butçe hem bo berdewamiya xebatan hem bo pêdiviyên zarokan yên cuda bi taybetî hatiye ragihandin ku divê berî her tiştî bê çareserkirin.

### Perwerdehiyên dilxwazan

A piştî vê jî ew e ku berî xebatan bo beşdaran perwerdehiyên dilxwaziyê bên dayîn. Beşdaran diyar kiriye ku derbarê rêvebirina dilxwazan kêmasiyên wan çêbûne û bo rêvebirina xebatên bi dilxwazan re pêdiviya wan bi perwerdehiyên xurtkirine heye.

### Cihên ewle û guncaw bo zarokan

Bo birêvebirina xebatê, pêdiviya bi cihên ewle û guncav jî xaleke din e ku derdikeve pêşberî me.

### Alîkariya profesyonelbûnê û supervîzyonê

Beşdaran di nirxandina xebatên xwe de diyar kiriye ku divê xebat û birêvebirîna xebatê bi awayekî profesyonel bibe û derbarê van pêdiviyan girîngiya alîkariya bi supervîzyonê ya têkildarî qonaxê nişan daye.

### Xurtkirina motîvasyon û kapasîteya hevkariyê

Qadeke din a ku beşdaran kêmasiya wê hîs kiriye, motîvasyon û kapasîteya hevkariyê ye. Ev di qonaxê de bo wan bûye asteng ku bi yên xwedî serboriyên wisa re bên cem hev û amûreke mîna sûpervîzyona hevsalan bandorker bi kar bînin. Di vê çarçoveyê de pêdiviya hevkariyê, komeke hevalan ku bikaribin xwe di nav de îfade bikin bo rêvebirên xebatê bûye pêdiviyeke sereke.

### Xebatên nirxandin û çevdêrîkirina bandorkeriyê

Di hevdîtinan de tê dîtin ku beşdaran bandora xebatê ya li zarokan nenirxandiye an jî çavdêriya wê nekiriye. Hin beşdaran gotiye ku ev kêmasiya nêzîkahîtêdanê ye. Pêdiviya bi nêzîkahîtedaneke têkûz jî di hevdîtinan de hatiye zimên.

### Sazûmanî

Dawiyê beşdaran nemaze nûnerên sazgehên civakî yên sivîl ragihandiye ku pêdiviya wan bi sazgehên rûniştî heye û sazûmanî bo berdewamiya xebatê berî her tiştî pêwîst e.

### III-4.2. Pêşniyazên Beşdaran yên Derbarê Bernameyên Perwerdehiya Xurtkirinê yên Qonaxa Amadekariyê

Di beşên rêbaz û bergehê de derbarê kargeh û perwerdehiya beşdaran a berî xebatê (perwerdehiya xurtkirine) agahî hatibû dayîn. Di hevdîtinan de, beşdaran ragihandibû ku perwerdehiya rêvebiran a berî xebatê û kargeh bo wan gelekî sûdwer bûn herwiha wan di nav xebatê de ferq kiriye ku pêdiviya wan bi xurtbûn û pêşveçûnê hebûye. Beşdaran, di vê çarçoveyê de, derbarê perwerdehî û naveroka perwerdehiyê ku dixwazin wergirin pêşniyazên taybet anîne zimên. Pêşniyazên bo perwerdehiyê ku ji agahiyên beşdaran hatine berhevkirin, wê armancê vedihewînin ku pêdiviyên li jor bên bidestxistin û bernameyên xurttir yên piştevaniya psîkososyal bên birêvebirin. Hemû pêşniyaz di Tablo 5ê de hatine rêzkirin.

# III-5.
## BANDORA ŞEWBA COVÎD-19Ê LI XEBATAN

Hevdîtinên derbarê lêkolînê rastî wê serdemê hatine ku şewba Covîd-19ê bandor li hemû cîhanê kir. Ji ber vê, di hevdîtinan de li ser nêrînên beşdaran yên derbarê birêvebirina xebatê û çavdêriyên wan hatiye rawestin. Hemû beşdaran diyar kiriye ku xebatên xwe sekinandine (di destpêka şewbê de û nemaze dema qedexekirina derketina kolanan hatiye ragihandin). Di vê qonaxê de li gel ku hin sazgehan navbereke dirêj daye xebatên xwe, hatiye dîtin ku sazgehên demeke dirêj xebat li vir kirine, bi awayekî çalaktir serî bi qonaxê derketine. Hin sazgehên ku xebata wan a qadê xwe dispêre demên dirêj, diyar kiriye ku bi pandemiyê re bi lez xwe bi rê xistine, bi lez plansaziya çalakiyan kirine û bi telefonê xwe gihandine dêûbavan û bi vî awayî hem pêdivî tesbît kirine hem dêûbav agahdar kirine.

Nûnerê saziyekê diyar kiriye ku wan kapasîteya xwe ya çareserkirina bilêz di dema şewbê de jî bi kar aniye. "Gava şewbê dest pê dikir me dikarîbû xwe bi lez bi rê ve bibin û çareseriyan bibînin." Hin sazgehan ragihandiye ku gava qedexekirinên derketina kolanan nebûne, xwestiye li cihên girtî çalakiyan bi rê ve bibin lê şert û mercên fizîkî yên van cihan bo dûrparêziya civakî ne guncaw bûne. Herwiha nûnerên sazgehên ku armanca damezirandina wan xebatên hunerî ne û tenê xebatên hunerê bi rê ve birine, diyar kiriye ku ji ber nebûna şert û mercên xebata rûbirû ew li gor sazgehên din demeke dirêjtir dûrî çalakiyan mane.

Hatiye diyarkirin ku di dema şewbê de pêdiviya herî girîng bikaranîna platformên dijital e û divê kapasîteya van platforman bê berfirehkirin. Hema bêje hemû beşdaran ragihandiye ku berê bi amûrên dîjital xebat bi rê ve nebirine, di vî warî de tecribeya wan nîne û pêdivî pê heye xwe di vê qadê de bi pêş bixin. Rêxistinên ku gelek salan hemû xebatên xwe rû bi rû kirine, diyar kiriye ku bi destpêkirina şewbê re derbarê birêvebirina xebatên xwe demekê zehmetî dîtine, hem bi wan re hem bi yên profesyonel an dilxwaz re tirs û xof çêbûye û serederîkirina vê tirs û xofê birêvebirina xebatê xistiye zorê. Herwiha hatiye ragihandin ku vê demê gelek kes ji karê xwe bûne û vê nemaze hêza xebatên bidilxwazî şikandiye. Pirsyariya çavderiyên beşdaran yên derbarê zarokên ku di vê demê de wan xwe gihandiye

TABLO 5: Pêşniyazên Beşdaran yên Derbarê Bernameyên Perwerdehiya Xurtkirinê yên Qonaxa Amadekariyê

| | |
|---|---|
| **Pêşniyazên Perwerdehiyê yên bo Rêvebiran** | • Kargehên parvekirina tecribeyan<br>• Perwerdehiyên birêvebirina dilxwazan/dilxwaziyê<br>• Perwerdehiya trawma, trawmaya duyemane û şiyanên lixwenerînê<br>• Perwerdehiya birêvebirina rîskan a têkildarî qada sepanê<br>• Perwerdehiya xebata bi zarokan re ya li qadê<br>• Perwerdehiya birêxistîbûnê<br>• Perwerdehiya nêzîkayiya dêûbavan<br>• Perwerdehiya pêşxistina projeyan<br>• Lobîkarî û perwerdehiya plansaziya stratejîk |
| **Pêşniyazên Perwerdehiyên Tematîk û Rêbazî yên Bo Xebatên bi Zarokan re** | • Perwerdehiya analîza wêneyên zarokan<br>• Perwerdehiya mafên zarokan<br>• Perwerdehiya beşdarbûna zarokan<br>• Perwerdehiya têkoşîna li hember îstîsmara zayendî ya zarokan<br>• Perwerdehiya nezîkayiya zarokan<br>• Perwerdehiya danûstandina zarokên ku hewcedariyên wan ên taybet hene<br>• Perwerdehiya sepandinê ya bi zarokan re<br>• Perwerdehiya danûstandinê û derbirîna hestên zarokan<br>• Perwerdehiya rêbazên piştevaniya derûnî bi rêya hunerê<br>• Perwerdehiya rêbazên piştevaniya derûnî bi rêya hunerê<br>• Perwerdehiyên bo ku jîriya dîtbarî ya zarokan gêştir bikin<br>• Perwerdehiya tespîtkirina pirsgirêkên reftarî û hestî yên zarokan<br>• Perwerdehiya danûstandina bêşidet<br>• Perwerdehiya raporkirin û çavderîkirinê<br>• Perwerdehiya plansaziya perwerdehiya onlayn |
| **Pêşniyazên Perwerdehiyê yên ku dê di Bernameyên Piştevaniya Psîkososyal de Bên Bikaranîn û Xebatên Hunerê Pêş Bixin** | • Perwerdehiya dramayê<br>• Kargeha heriyê<br>• Perwerdehiya xebatên bi zarokan re û dans<br>• Perwerdehiya lîstikên lihevbanîn<br>• Kargeha çêkirina tiştên bi kulavan û orîgamî<br>• Perwerdehiya kodkirina robotîk<br>• Perwerdehiya kuklayan |
| **Pêşniyazên bo Sazkirina Perwerdehiyan** | • Divê perwerdehî demdirêj bin<br>• Divê li gorî parêzgehan perwerdehî bên dayîn<br>• Divê naveroka wan li gorî hewcedarî û taybetmendiyên wîlayetan bê amadekirin<br>• Divê berî ku naverok bê amadekirin hewcedariya beşdaran bê diyarkirin<br>• Divê perwerdehî bi awayê pirzimanî û pirçandî bên dayîn |

wan jî hatiye kirin. Beşdarên ku danûstandina wan bi zarok û dêûbavên wan re çêbûye, diyar kiriye ku vê qonaxê gelek bandor li derûniya zarokan kiriye, nemaze zarokên di qonaxa pêşdibistanê de gelekî tirsiyane û diltirsî bi wan re çêbûye.

Agahiyeke din jî bi wê re têkildar e ku rê li ber bidestxistina mafê perwerdehiya zarokan hatiye girtin. Di vê demê de gelek zarok, bi sedema ku jêrgeha teknolojîk ne têkûz e, li mala wan telefonên biaqil an kompîtir nînin, înterneta bi malê ve ne girêdayî ye û cihên sûdwergirtina/xwegihandina Tora Perwerdehî û Agahzaniyê[47] kêm in, ji perwerdehiyê bêpar mane û ev agahiyeke hevpar a beşdaran e. Herwiha bi sedema ku pergala EBAyê ne pirzimanî ye, zarokên zimanê wan ne tirkî ji aliyê mafê perwerdehiyê ve dûçarî携 zererê bûne. Sazgeheke beşdar ragihandiye ku derbarê bêpariya mafê perwerdehiyê yê vê qonaxê çavdêrî kirine û rapor nivîsandine û agahiyên bidestxistî bi Wezareta Malbat, Xebat û Xizmeta Civakî, Rêveberiya Parêzgehê re parve kirine.

# IV

# ENCAM Û PÊŞNIYAZ

Di vê beşê de dê bi agahiyên ji hevdîtinan bidestxistî, kurteyeke nirxandin û dahurînê cih bigire û piştre dê pêşniyazên derbarê nexşerêyê û sepana wê bên rêzkirin.

# IV-1.
## ENCAM

Li Tirkiyeyê piştî nêzî çil salên bi şer û pevçûn di navbera 2013-2015an de demek bêpevçûn derbas bûye. Piştî vê dema bêpevçûn di navbera Temûza 2015 û Temûza 2016an de li navendên wan bajaran ku bi piranî kurd lê dijîn pevçûnên giran rû daye. Piştî ku dawî li van pevçûnên giran tê, bi Biryarnameyên di Hikmê Qanûnê de ku bi rewşa awarte ya di Temûza 2016an re hatin ragihandin; bi sedan komele hatin girtin, bo rêvebiriyên herêmî qeyûm hatin tayînkirin, bi hezaran karmendên dewletê ji kar hatin avêtin ku mamoste jî di nav wan de bûn. Vê jî rê li ber wê vekir ku li bajaran rewşa siyasî ya bi şer û pevçûn berdewam bike.

Vê qonaxê, di serî de zarokên li van bajaran, di astên cuda de be jî rasterast bandor li her kesî kir. Binpêkirina mafê jiyanê, kesên winda, cihguhertina bi darê zorê û koçberî, bêpariya ji mafê perwerdehî û tendirustiyê, guherîna pratîkên takekesî û gelemperî yên têkildarî bajêr, zererên jîngehî û aborî, dûçarbûna zordarî û şidetê û gelek serboriyên trawmatîk yên mîna van bi berbelawî rû dane. Mixabin li gel zarokan kes û sazgehên rêvebirên xebatên bo zarokan jî ji vê qonaxê bêpar nemane û bi zehmetiyên birêvebirina xebatê re rû bi rû mane. Ev zehmetî ew in ku xwe negihandine çavkaniyên pêwîst, bikaranîna zimanê zikmakî hatiye astengkirin, xebatkarên dilxwazê xebatê nehatine dîtin, xebat û rêvebirên xebatê hatine krîmînalîzekirin û vê jî bo destûra sazgehên fermî xetereyek bi xwe re aniye. Tayînkirina qeyûman bo rêvebirên herêmî ku sedema sereke ya rewşa siyasî ya bipevçûn e, rê li ber wê girtiye ku alîkariya lojîstîk (cih, veguhastin û hwd) bê kirin. Hin kes û sazgehên ku rêvebirên xebatên mijara lêkolînê ne ji Xebatên bo Zarokan yên Anadolu Kulturê alîkariya fonê û perwerdehiyê bi dest xistiye û vê, serederîkirina zehmetiyan hêsan kiriye.

Li gel van hemû zehmetiyan, di Temûza 2015-Kanûna Paşîn a 2016an de li 5 bajaran ku lêkolîn li wan bûye, xebatên bo zarokan dewam kiriye. Li gel ku kes û sazgehên pisporên van karan xebat bi rê ve biriye, sazgehên hunerê û hunermend, rêxistinên pîşeyî û kes û sazgehên rêvebirên çalakiyên civakî-siyasî jî tevlî xebatê bûne. Di nav rêvebirên xebatê de li gel wan sazgehên ku demeke dirêj li wir xebat bi rê ve birine, hin rêxistinên civakî yên sivîl hene ku bo çareserkirina pêdiviyên qonaxê hatine damezirandin. Di hemû xebatan de armanca giştî ew e ku bandora serboriyên trawmatîk yên girêdayî şer û pevçûnê yên zarokên xwedî taybetmendî û pêdiviyên cuda dakeve asta herî kêm. Herçiqasî ev xebat bi navê bernameya piştevaniya psîkososyal nehatibe têgihîkirin jî ev bername bi armanc û rêbaza xwe vê taybetmendiyê vedihewîne.

Di van xebatan de huner gelek caran wekî rêbazekê hatiye bikaranîn, sedema sereke ya vê ew e ku kes û sazgehên bo zarokan xebatê bi rê ve dibin, dîtiye di bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal de huner çiqasî bandorê li zarokan dike û pê re wan rehet û xurt dike. Ji ber

ku rêvebiran di bernameyên berê de bandora hunerê tecribe kiriye, wan di xebatên vê demê de jî huner wekî mecbûriyetekê dîtiye û di bernameyan de cih daye hunerê.

Bikaranîna hunerê ya di bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal de ji aliyê rêvebirên xebatê ve bi awayekî zelal hatiye çavdêrîkirin. Hatiye fêmkirin ku huner bo serboriyên trawmatîk yên zarokan wekî derman e û zarok pê rehet dibin û tên ser xwe. Hatiye dîtin ku ev bernameyên piştevaniya zarokan bo rêvebiriyên duçarî şer û pevçûnê jî sazker in û hêza wan xurt dike. Ev xebat, ji aliyê mezinan ve wekî nîşana wê hatiye dîtin ku li hember rewşa siyasî ya bipevçûn jiyan hê jî dewam dike. Huner bûye alîkar ku li gel zarokan dêûbav jî reşbîniyê ji ser xwe biavêjin an reşbiniya wan kêm bibe.

Di dema lêkolînê de derbarê bandora li zarokan a cihguhertina bi darê zorê û koçberiyê ya girêdayî pevçûnan hişyarî bilind e. Sedema vê hişyariyê tecribeyên berî 2015an yên mîna kampa êzîdiyan, Şerê Suriyeyê û cihguhertinên bi darê zorê yên berî van salan û valakirina gundan e. Bajarên ku lêkolîn li wan bûye di vê mijarê de xwedî tecribe ne.

Qonaxên pevçûnê, bo zarokan pêdiviya bi qadên ewle derxistiye pêş. Kes û sazgehên rêvebirên xebatê, bi rêbertiya mezinan û di qadên ewle de zarok li hev civandine. Lihevcivîna li qadên ewle, bo wê bûye alîkar ku dêûbavên jihevdûrketî, girêdayî rewşa siyasî dijberî hev û rengvedana vê di jiyana xwe ya rojane de dibînin, hîsa bihevrebûnê ji nû ve saz bikin.

Bikaranîna kurdî di xebatan de ji aliyê piraniya rêvebiran ve bi taybetî hatiye tercîhkirin. Kurdî carina bo xwegihandina zarok û dêûbavan carina bo sazkirina bawerî û nêzîkayiyê hatiye bikaranîn. Bikaranîna zimanê kurdî bo hin sazgehan armanceke sereke ye. Xebatên hunerê yên bi zimanê zikmakî; nîşanî kesên nikarin li dibistanê zimanê xwe yê zikmakî bi kar bînin daye ku êdî ew dikarin zimanê xwe yê zikmakî jî bi kar bînin. Vê qonaxê, eşkere nîşanî me daye ku bikaranîna zimanê zikmakî; bo hilberînê, bo danûstandinê, bo piştgiriyê û başbûnê gelekî bandorê li zarokan dike.

Li gel zehmetiyan, hemû beşdaran diyar kiriye ku divê ev xebat bidomin û bên pêşxistin. Bo berdewamiya xebatan di serî de pêdivî bi butçeyê heye. Perwerdehiyên dilxwazan yên berî xebatê pêdiviyeke din e ku dê bandora xebatê xurt bike. Sazûmanî, pisporî, piştevaniya bi supervîzyonê pêdiviyên din in. Kes û rêvebirên xebatê; bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal bi rêbaz û amûrên hunerê yên nû li dar xistine û bo ku bandora van xebatan zêde bikin, di warê mijarên tematîk de pêdivî bi perwerdehiyê hene û hin pêşniyazan dikin.

# IV-2.
## PÊŞNIYAZ

Bo di demên pêş de xebat bi awayekî kartêker berdewam bikin em dixwazin hûn bala xwe bidin tesbîtên li jêr ku ji tecribeyên qadê hatine bidestxistin;

- Divê bernameyên piştevaniyê yên bo zarokên di bin bandora pevçûnê de, bêhtir bên kirin û di van bernameyan de huner bêhtir bê bikaranîn ku ev bo bandorkeriya xebatên bo zarokan gelekî girîng e. Bo berbelaviya van xebatan divê fon piştevaniya kes û sazgehan bikin û ji aliyê naverok û rêbazê ve alîkarî bê kirin ku xebat xurt hêsan bibe. Divê stratejî bên pêşxistin ku bandora van xebatan zêde bibe, serederîkirina zehmetiyan hêsan bibe û bo fêmkirina girîngiya xebatên hunerê bibin alîkar.
- Divê pêdiviyên piştevaniyê yên demkurt û demdirêj yên di astên cuda de yên bo wan zarokan ku li herêmên şer û pevçûnê dijîn an berî/piştî pevçûnê mecbûr mane koç bikin bên tespîtkirin, nêzîkahîtêdanên curbicur ku piştevaniya bi hunerê jî vedihewînin bên pêşxistin û bi berbelavî bên sepandin û derbarê bandora wan agahî û tecribe bên parvekirin û ev qad bê geşkirin.
- Divê bi dêûbav, perwerdekar, civaka sivîl, biryarder, rêvebiriyên herêmî re ew xebat bên kirin ku derbarê bandora pevçûnan a li zarokan bên hişyarkirin.
- Divê bo diyarkirina zarokan, danegeheke herêmî û mafparêz bê avakirin û plansaziya xebatan li gor wê bê kirin. Ew agahî ku li kîjan bajarî çiqas zarok hene, vê qonaxê çawa bandor li wan kiriye dê bibin alîkar ku bo xebatan plansaziyeke kartêker bê kirin.
- Gava em dibêjin zarok em ne behsa komeke homojen dikin. Ast û awayê bandora pevçûnan a li zarokan cuda ye. Li gel vê, divê temen, zayend û pêdivî û têkiliyên takekesî yên zarokan jî li ber çavan bên girtin û bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal yên cuda bên sewirandin.
- Divê bo xizmeta supervîzyonê ku kes û sazgehên rêvebirên bernameyên piştevaniya psîkososyal jê sûd werdigirin di plansaziya xebatan a serî de -heke pêwîst be- butçe bê veqetandin.
- Divê bo xurtkirina rêvebiran perwerdehiyên berfireh bên kirin, di van perwerdehiyan de derbarê bikaranîna amûrên hunerê û bandora wan agahî bên dayîn. Li herêmên pevçûnê hawizekî perwerdekarên di qada xwe de pispor bê avakirin ku ji rêbazên hunerî û nêzîkahîtêdanên derûnî sûd werdigirin. Divê perwerdehî li derveyî bajêr, li wan deran bên kirin ku mirov motîve dikin. Lewra rêveber jî di nav şer û pevçûnê de mane û demeke kurt be jî ji wî cihî dûr bikevin dê motîvasyona wan zêde bibe.
- Divê toreke ragihandinê bê sazkirin ku di navbera kes û sazgehan -çi li nav bajêr çi di navbera bajaran de- de danûstandin bê kirin.
- Divê derfeta wê bê bidestxistin ku kes û sazgehên di warê bikaranîna hunerê di bernameyên piştevaniya psîkososyal de xwedî tecribe, vê tecribeya xwe parve bikin. Her tecribe bo wê alîkar e ku xebatên nû û hîn bandorker bên kirin û pirsgirêk ji serî de bên dîtin û li gor wê çareseriyeke bilez û rast bê dîtin.
- Di xebatên psîkososyal de, divê amûrên hunerê nemaze gava li ser bandora trawmayên zarokên li herêmên şer û pevçûnê zîq dibin bi pisporan re bên diyarkirin, di demeke dirêj de, hevgirtî, bi bernameyên birêkûpêk bên sepandin û encamên wan bên nirxandin da ku bernameyên nû bên pêşxistin. Divê derbarê nimûneyên cîhanê yên baş ên vê qadê lêkolîn bên kirin û encamên wan bên parvekirin.

- Di wan xebatan de ku bi piştevaniya Xebatên bo Zarokan yên Anadolu Kulturê tên kirin, divê maweya sepanê demdirêj be ku bandora xebatan zêde bibe. Xebatên demdirêj bo sazkirina guherînê bandorker in. Divê bo vê butçe bê sazkirin û mirov bên dîtin.
- Divê bandora bikaranîna zimanê zikmakî ya li zarokan ya di bernameyên piştevaniya psîkososyal de bê eşkerekirin û xebatên hunerê yên bi zimanê zikmakî bêhtir bên kirin.
- Di sazkirin û rêvebirina xebatan de bi mebesta rêzdariya mafên zarokan divê di vê qonaxê de di serî de beşdariya zarokan, rêgezên mafên zarokan bên pejirandin.
- Bo beşdariya dêûbavan a bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal divê xebatên xurtkirinê bên kirin. Dê awa û rêbazên cuda, beşdarbûna dêûbavan a van qonaxan hêsan bike.
- Divê mekanîzmayên çavdêriyê yên sîstematîk bên sazkirin ku bandorkeriya xebatan binirxînin. Bi vî awayî dê hem encamên xebatê bi awayekî zelal bên dîtin hem pêdivî û potansiyela zarokan derkeve holê. Dê ev hemû bo xebatên nû bibin alîkar. Di vê çarçoveyê de bi mebesta ku bandora psîkososyal a xebatên hunerê binirxîne, afirandina derfetên piştevaniya teknîk jî girîng e.
- Divê ev bernameyên ku di nav şer û pevçûnên giran an sivik de tên birêvebirin -bi mebesta ku bo bernameyên piştevaniyê yên psîkososyal yên bi di nav şer de ku di lîteratûra dinyayê de jî kêm in bibe çavkaniyek- bên nivîsîn, bi zimanên cuda bên tescîlkirin. Tecribeyên welatên din jî bo rêvebirên van xebatan bên belavkirin.